## Xebatên cuda mijarên hevpar

Li Amedê ji bo 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê pêşengeha berhemên sê jinan hat li dar xistin. Di pêşengeha ku bi xebatên Neşe Toprak, Zozan Bor û Fîgan Ektî ve hatî amadekirin de, jin bi navê xebatên 'Ked', 'Hêvî' û 'Jin kî ye' tev li pêşengehê bûn... *R.11*



## Di karê weşangeriyê de jin

Der barê jinên di nav karê weşangeriyê de cih digirin û zehmetiyên wan de, em bi yek ji xwediyên weşanxaneya Payîzê Serdem Kahraman û yek ji xwediyên Pirtûka Kurdî Berfîn Huseynî re axivîn. Berfîn Huseynî da zanîn ku her diçe jin di her qadê de gavên saxlem diavêjin... *R.11*






# xwebûn

8-14 ADAR 2021 HEJMAR: 64 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Divê ev roj bibe her roj

8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê li gelek deverên cîhanê û li Kurdistanê hat pîrozkirin. Bi minasebata vê rojê jin ji rojnameya me re axivîn û behsa têkoşîna xwe kirin. Rojnameger Cîhan Bîlgîn da zanîn ku divê ev roj tenê bi rojekê neyê sînordarkirin û wiha axivî: "Ne tenê rojek her roj roja jinan e û bi berxwedanên gelek mezin ev roj hat ragihandin."... *R.6*

## Roja nan û gulê, şer û şahiyê

Mirov dikare têkiliya yekser û rasterast a di navbera têgehên wek "bindestî, tekoşîn, serkeftin û şahiyê" de, di gelek bûyerên dîrokî de bibîne. Ger mirov bi awayekî mantiqî li van têgehan û rêzbûna wan a dîrokî binihêre, pêvajoyeke sîstematîk derdikeve pêşberî me: ango li dijî bindestiyê tekoşîn tê meşandin û di dawiyê de serkeftin tê pîrozkirin. Lê em bi taybetî ji dîroka xwe ya kurdan jî dizanin ku ev yek wisa ne hêsan e û li gorî rêzê nameşe. Di navbera van têgehan de têkiliyeke tevlihev heye, her tim li gorî rêzê nameşin, carinan çend xal bi hev re derdikevin qadê, an jî berevajî tên jiyîn, an jî hin jê nabin mijar. Ligel vê hin roj hene ku ev her çar têgeh bi carekê û bi hev re dikevin rojeva mirovan. Roja 8'ê Adarê jî rojeke bi vî rengî ye...

***Munewer Azîzoglu Bazan / R.7***




Serkeftina jinan — Yasemîn Elban / R.7

## Li Iraqê şerê Tirkiye û Îranê

Dewleta tirk bi êrîşên qirkirinê re dixwaze sînorên xwe yên 'Mîsakî Millî' ji nû ve zindî bike. Ev êrîşên li ser herêma Şengalê û dagirkeriya li başûrê Kurdistanê weke çirûskên destpêkê yên vê planê tên dîtin. Wezîrê Karê Derve yê Iraqê 28'ê sibatê serdana Îranê kir. Piştî wê serdanê Sefîrê Îranê yê Bexdayê Irec Mescîdî ji ber êrîşên leşkerî yên li dijî axa Başûr, dewleta tirk rexne kir û got: "Em qebûl nakin ku Tirkiye yan jî dewleteke din bi awayekî leşkerî dest li Iraqê werde. Çi eleqeya Tirkiyeyê bi Şengalê re heye? Piştî vê daxuyaniyê îcar sefîrê Tirkiyeyê yê Bexdayê Fatih Yildiz...

***Felemez Ulug / R.2***

## PDK dixwaze çi bike?

Polîtîkayên PDK'ê yên demên dawî di nav kurdan de dibin sedema nerazîbûnan. PDK li aliyekî rê li pêşiya dewleta tirk vedike ku başûrê Kurdistanê were dagirkirin. Her wiha niha di navbera PDK û YNK'ê de alozî her diçe mezin dibin. Li aliyê din bangewaziyên yekitiya neteweyî ya kurdan bê bersiv tên hiştin û dijberiyeke tund bi şoreşa Rojava re tê kirin. Herî dawî jî heyeta Hevpeymaniya Niştimanî ya Suriyeyê ya girêdayî Tirkiyeyê, serdana Hewlerê kir. Hat gotin ku çeteyên DAIŞ'ê ku çend sal berê nêzî Hewlêrê bûbûn vê carê bi cil û bergên dîplomatîk ketin bajêr... *R.2*

# Rexnedayîn: Fêrbûn, axaftin û nivîsîna bi kurdî ye



HDP'ê ji bo kar û barên zimanê kurdî, 'Nexşerêya Kurdî' amade kir û ji bo şopandina vê nexşerêyê 'Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî' ava kir. Hevberdevka Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî Dersim Dag pirsên rojnameya me bersivandin û diyar kir ku dê bi fêrbûn, axaftin û nivîsîna bi kurdî rexnedayîna xwe bidin û wiha got: "Parastin û bipêşxistina zimanê kurdî erka me ya sereke ye û deynê stûyê me ye li ber mîrasa me ya têkoşînê û gelê me."... ***Hevpeyvîna Felat Niştiman / R.4***

## Edaletê xoceyê Xasî

Mîyanê ma kurdan de, deştan de şarî pez kerdêne weye, la dewanê mîyanê koyan de dewarî kerdêne weye. Zehfê ci zî serê keyî yew-di mangay bî. Înan qeybî qatixî, mast, şit, rûn, çî anayînî, qeybî kê xo, kerdêne weye. Dewicê ke feqîrî bî, nêşkayêne pere bidê gawanêke, belkî hewce zî nêkerdêne, bi dewre şîne verê heywanan... ***Cemîl Oguz/ R.9***

## Mûtasyon zû belav dibe

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) têkildarî zêdebûna pêketinên nû yên vîrûsa koronayê û cureyên wê de hişyarî da.
Li gor agahiyên rêvebirên WHO'yê cureya nû ya vîrûsa koronayê ku cara pêşîn li Brîtanyayê hatibû dîtin, li 43 welatên Ewropayê û li 23 welatên Afrîkaya Başûr jî hatiye dîtin. Her wiha WHO'yê da zanîn ku hefteya borî li Ewropayê hejmara pêketiyan ji sedî 9 zêde bûye. Rêvebirê WHO'yê yê Ewropayê Hans Kluge, der barê rîskên belavbûna vîrûsa koronayê de diyar kir ku gel ji ber sînordarkirinên li hember vîrûsa...*R.2*

## Keleha Çeqçeqo

Kelehek li delavê Dengiza li ser têketina rêya Kunfir heye navê wê keleha Çeqçeqo ye. Newala piştî wê jî newala Çeqçeqo ye. Gelo em çiqasî axa pîr û kalan, erdnîgariya ku em li ser dijîn nas dikin? Bi dorfirehî dixwazim qala wê keleha li Delavê Dengiza ya bi navê Çeqçeqo û pê re jî ya derdorê bikim û êdî rista dîrokzan û arkeologan e. Pêşî qala derdorê bi gelemperî bikim. Ji biniya keleha Çeqçeqo Govê ku ev der bajarekî kevn e... ***Feratê Dengizî/ R.5***



## Kolan hat dagirkirin

Polîsan kolana Nacîbey a avahiya HDP'a Wanê dorpêç kir û nehişt kes biçe HDP'ê. Parlamenterên bajêr Mûrat Sarisaç, Mûazzez Orhan û rêveberên partiyê, bertek nîşan dan... *R.3*

## Zarokên dîsleksî û pîtol

Dîsleksî zehmetî û astengiyên hînbûna zarokan e. Zarokên ku dîsleksî bin dereng dest bi axaftinê dikin. Dema dest bi axaftinê bikin jî di dengderxistin û axaftinê de zehmetî dikşînin. Nexweşiyeke zarokan a wiha ye ku dema zarok hîn biçûk in, mirov tê dernaxe. Dîsleksî ne kêmbûna zekayê ye. Zarokên dîsleksî ji aliyê zekayê ve tu kêmasiya wan tune ye. Bi tenê di xwendinê de zehmetiyê dikişînin. Tîp, kîte û peyvan bi rêzê re nikarin bibînin û bixwînin. Carnan şaş dixwînin û carnan jî bi ser hinek kîte, peyv û hevokan re baz didin ango rast naxwînin. Di polê de li pey hevalê xwe dimînin. Dema dixwînin aciz dibin, ji xwendina xwe fêm nakin. Nikarin konsantre bibin û serê wan diêşe. Çend cureyên dîsleksiyê hene. Ji wan cureyan du jê yên gelemperî û bingehîn in... ***Amed Tigrîs / R.5***

# PDK dixwaze çi bike?

Şandeya Hevpeymaniya Niştimanî ya Sûriyeyê ya girêdayî Tirkiyeyê, serdana Hewlerê kir. Kurdan ev serdan bi tundî şermezar kir û wek binpêkirina nirxên kurdan bi nav kirin

Navenda Nûçeyan

Hevpeymaniya Nîştimanî ya Suriyeyê tê zanîn ku ji komên çeteyên girêdayî Tirkiyeyê pêk tê. Di sala 2018'an de tev li êrîşên dagirkeriya Efrînê bûn û piştre jî di sala 2019'an de tev li dagirkirina Girê Spî û Serekaniyê bûn.

Şandeyek ji 'Hevpeymaniya Niştimanî ya Sûriyeyê' 1'ê adara vê salê serdana Hewlerê kir. Şande bi pêşengiya Nesir Herîrî li Hewlerê bi serokê giştî yê PDK'ê Mesûd Barzanî, serokwezîrê başûrê Kurdistanê Mesrûr Barzanî û rayedarên ENKS'ê re civiya.

Çûyîna Herîrî û pêşwazîkirina wî ya ji aliyê Mesûd Barzanî ve, rastî bertekên gelê kurd hat.



**Aldar Xelîl bertek nîşan da**

Endamê Desteya Hevserokatiya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Aldar Xelîl û gelek derdorên din ev hevdîtinên li Başûr rexne kirin. Xelîl têkildarî pêşwazîkirina şandeya bi pêşengiya Nesir Herîrî ya ji aliyê rayedarên Başûr ve li ser hesabê xwe yê medyaya civakî wiha got: "Çeteyên DAIŞ'ê yên ku beriya 3 salan bi çend kîlometreyan dûrî Hewlêrê bûn û şêniyên Efrînê, Serêkaniyê û Girê Spî koçber kirine, niha bi cil û bergên siyasî û dîplomatîk dikevin Hewlêrê."

**18 rexistinan daxuyanî dan**

18 rêxistinên hiqûqî û sivîl ên li Sûriyeyê û derveyî Sûriyeyê jî bi daxuyaniyeke hevpar bang li serokatiya başûrê Kurdistanê, parlamanto, hikûmet û xelkê wê kirin û diyar kirin ku serdana Nesir Herîrî ya ji bo herêmê, di serî de gelê kurd û şehîdan, biçûkxistina tevahiya mirovahiyê ye.

**PYNK'ê bang kir**

Partiyên Yekitiya Nîştimanî ya Kurdî (PYNK) jî têkildarî serdanê daxuyaniyek da. PYNK'ê diyar kir ku Herîrî li Hewlêrê planên dijminahiyê yên qirêj li dijî gelê kurd û destkeftiyên wan ragihandin û destnîşan kir ku ya balkêş ew e ku kesê ew pêşwazî kiriye, bêdeng maye. PYNK'ê bang li gel kir ku li hemberî van komployan helwesteke tund nîşan bidin.

**PDK'a Sûriyeyê**

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurdistanê ya Sûriyeyê Gêlo Îsa jî bi gotina 'kujerê zarokên kurdan' bertek nîşanî pêşwazîkirina Herîrî da. Îsa di daxuyaniya xwe de wiha got: "Herêma Kurdistanê ji bo kurdan xwedî cihekî gelek binirx e. Ev herêm hêviya kurdan e. Lê belê rayedarên herêma Kurdistanê û bi taybetî birêz Barzanî divê kujerê kurdan ê vê carê kincên dîplomatan li xwe kirî, qebûl nekira."

**Ev ne cara yekem e**

Siyasetmedarê kurd Elî Kerîmî der barê mijarê de da zanîn ku ev ne cara yekem e ku şandeyên wiha bêkêr û bikîn tên Hewlêrê û wiha axivî: "Tê zanîn ku komên bi vî rengî qet nebûne dostê doza kurdî û timî cihê wan di bin konê eşîra Barzanî de hebûye. Şandeya bi serokatiya Nesir Herîrî ku çeteyekî MÎT'a Tirkiyeyê ye, ji bo jî Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê re pirsgirêkan derbixe û ezmûna wê tune bike hatiye Hewlêrê. Vê jî bi hîle û stratejiya Tirkiyeyê dike."

**Tev li dagirkirinê bûn**

Siyasetmedar Kerîmî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev komên çete, me tevan dît ku tev li dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî bûn. Ji bo dagirkirina van bajaran piştgirî û hevkarên dewleta tirk bûn. Dostên Osmaniyan bûn û li Hewlêrê tên bi Mesûd Barzanî re dicivin. Yek ji xalên serkeftina ezmûna rojavayê Kurdistanê ew e ku rê nedaye pêşbaziya hizbî. Ji ber ku di salên 70'yan de ev yek çavkaniya nehemahengiya başûrê Kurdistanê bû, wan ders ji vê yekê girt û nehiştin pêşbaziya hizbî derkeve û wê ezmûnê têk bibin."



## Mainza: Ev yek xeter û şerm e

Endama Komîseriya Amerîkayê ya Azadiya Olan a Navneteweyî Nadine Mainza li ser hesabê xwe yê medyaya civakî bertek nîşanî serdana Nesir Herîrî da û wiha got: "Nesir Herîrî nûnerê terorîstan û qatilê şehîd Hevrîn Xelef e. Niha bi navê Hatim Ebû Şeqra li Herêma Kurdistanê ye û bi Mesûd Barzanî re dicive. Ev yek xeter û şerm e." ***WASHINGTON***



# WHO'yê hişyarî da: Mûtasyon zû belav dibe

Navenda Nûçeyan

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) têkildarî zêdebûna pêketinên nû yên vîrûsa koronayê û cureyên wê de hişyarî da.

Li gor agahiyên rêvebirên WHO'yê cureya nû ya vîrûsa koronayê ku cara pêşîn li Brîtanyayê hatibû dîtin, li 43 welatên Ewropayê û li 23 welatên Afrîkaya Başûr jî hatiye dîtin. Her wiha WHO'yê da zanîn ku hefteya borî li Ewropayê hejmara pêketiyan ji sedî 9 zêde bûye.

**Divê tedbîr bidomin**

Rêvebirê WHO'yê yê Ewropayê Hans Kluge, der barê rîskên belavbûna vîrûsa koronayê de diyar kir ku gel ji ber sînordarkirinên li hember vîrûsa koronayê her çiqas westiyabin jî divê tedbîr bidomin û wiha got: "Niha em dibînin ku mûtasyon pir zû belav dibe."

**Li Tirkiyeyê**

Hefteya borî li Tirkiyeyê jî tedbîr hatin guhertin û li gor rîska koronayê ya li bajaran tedbîr hatin sistkirin. Rewşa sistrina tedbîran li gor hejmara pêketiyan, encama PCR'ê û li gor rêjeya venêrîna hûr û hejmara nexweşên entûbe hat diyarkirin. Ev yek ji aliyê saziyên tenduristiyê yên sivîl ve û xebatkarên tenduristiyê ve hat rexnekirin. Xebatkarên tenduristiyê diyar kirin ku ligel ku hejmara pêketiyan zêde dibe jî asayîkirina pêvajoyê xetereyeke pir mezin e û wiha gotin: "Li gorî daneyên sînordarkirî yên Tirkiyeyê ji pêvajoya asayîbûnê re hê pir zû ye."



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Li Iraqê şerê Tirkiye û Îranê

Dewleta tirk bi êrîşên qirkirinê re dixwaze sînorên xwe yên 'Mîsakî Millî' ji nû ve zindî bike. Ev êrîşên li ser herêma Şengalê û dagirkeriya li başûrê Kurdistanê weke çirûskên destpêkê yên vê planê tên dîtin.

Wezîrê Karê Derve yê Iraqê 28'ê sibatê serdana Îranê kir. Piştî wê serdanê Sefîrê Îranê yê Bexdayê Irec Mescîdî ji ber êrîşên leşkerî yên li dijî axa Başûr, dewleta tirk rexne kir û got: "Em qebûl nakin ku Tirkiye yan jî dewleteke din bi awayekî leşkerî dest li Iraqê werde. Çi eleqeya Tirkiyeyê bi Şengalê re heye?

Piştî vê daxuyaniyê îcar sefîrê Tirkiyeyê yê Bexdayê Fatih Yildiz li ser hesabê xwe yê medyaya dîjîtal bersiv da Îranê: "Kesê ku herî dawî rabe ji Tirkiyeyê re bibêje rêzê li sînorên Iraqê bigire, sefîrê Îranê ye."

Serokê meclisa Iraqê Muhammed Halbusî jî li ser malpera xwe, nav neda lê dîplomatên biyanî hişyar kirin û got: "Hûn li vir dewleta xwe temsîl dikin, li ser têkiliyên di navbera welatan de bixebitin. Têkilî karên navxweyî nebin."

Hewildanên dewleta tirk ên ji nû ve zindîkirina sînorên Mîsakî Millî ji aliyê Îranê ve bi dagirkeriyê tê binavkirin. Îran gefên dewleta tirk ên li ser herêma Şangelê wek êrîşeke li ser Mûsûlê dibîne. Ji ber van tehdît û gavên tên avêtin di navbera her du welatan de tansiyon rabûye.

Peymana Mîsakî Millî li gorî rewşa siyasî û hevkariya hêzên navneteweyî ve hatiye îmzekirin. Neteweperestiya tirkan bi taybetî jî tûranparêz li gorî rewşê her tim di nav hewildanên ji nû ve zindîkirina Mîsakî Milliyê de bûne. Ev kes li gor berjewendiyên Tirkiyeyê, carna jî sînorê Osmaniyan ên berî peymana 1916 Sykes-Pîcotê ya îngilîz û fransizan, yanî sînorên ku rojava û başûrê Kurdistanê û beşek jî Ermenistan û heta Bulgaristan jî di nav de ye bi bîr tînin.

Ev xewn û xelaya tirkan a sedsalî bi pevçûn û krîza siyasî ya li herêmê heyî ji nû ve ketiye rojeva dewleta tirk. Bajarê Mûsûlê ji ber rola xwe ya dîrokî her tim bala dewletên herêmê kişandiye ser xwe. Ji ber pêşveçûnên li herêmê diqewimin ev herêm bala Îranê jî kişandiye. Ji ber gefa dewleta tirk a li ser herêmê Wezîrê Karê Derve yê Îranê Cewad Zarîf bi gotina; "Em hebûna leşkerên tirk ên li Iraq û Sûriyeyê red dikin." Her çend ev gotin nehatibin piştraskirin jî, bû sedem ku di navbera Îran û Tirkiyeyê de dengên cuda bilind bibin.

Dema artêşa tirk êrîş bir ser herêma Garê, hêzên Heşdî Şabî jî hêzeke mezin ber bi Şengalê ve şand. Ev hêza ku li herêmê bi cih bû xwe li gor êrîşên ji aliyê Tirkiyê ve bên bi cih kir. Bêguman bi hevkariya PDK'ê dewleta tirk ev demek dirêj e hebûna PKK'ê li Şengalê dike hincet û bi vê hincetê gelek caran li ser herêmê êrîşên hewayî pêk anîn. Bi van êrîşan ve girêdayî armanca dewleta tirk dagirkirina Şengalê û bi vê jî xwe gihandina Telafer û Mûsilê.

Em ji bîr nekin ku di hişmendiya tirkên rastgir û nijadperest de Mûsil her tim wek parçeyê Tirkiyeyê tê dîtin. Ev alî bi desthilatdariya AKP-MHP'ê ve, hewil didin ku peymanên Sykes-Pîcot û Lozanê ji nû ve têxin rojevê. Ji bo li herêma Mûsilê bibin xwedî nifûs jî eleqeyek mezin nîşanî tirkmenên Telaferê didin.

Lê tevî vê eleqeya baş jî di vê pêvajoyê de nêzîkatiya tirkmenên herêmê ji bo Tirkiyeyê hatin guhertin. Şîiyên tirkmen di bin navê xweparastinê de hîn bêhtir nêzî Îranê bûn û bi erebên şîi re têkiliyên xwe xurt kirin. Ji ber ku dewleta tirk ev tehlûke dîtin ji bo parastin û îqnakirina tirkmenan leşkerên xwe li herêma Mûsil Başîqa bi cih kirin. Ev baregeh ji bo MÎT'a tirk li herêmê bikaribe li ser van pêkhateya kar û xebatên cuda bide meşandin bi taybetî hat hilbijartin. Armanca wê ya yekemîn jî manîpulekirina tirkmenan e.

Em ji bîr nekin ku li dijî vê hemleya Tirkiyê, dewleta Îranê jî bi karta Heşdî Şebî xwest ku têkeve denklema Mûsilê. Em ji bîr nekin ku Mûsil yek ji navendên girîng ên DAIŞ bû. Bi van pevçûnan ve îhtîmala heye ku bi destê dewleta tirk li herêma Mûsilê DAIŞ ji nû ve dest bi çalakiyan bike. Ev yek jî di nav gel de nerehetiyekê çêdike. Lewma li dijî vê tehdîdê tirkmenên Mûsilê rola pêkhateya Heşdî Şebî girîng dibînin.

Dewleta tirk bi emelên xwe yên xirab û hişmendiya xwe ya yekperest dixwaze hevsengiyên herêmê xera bike. Divê ji vê siyaseta pûç û bêencam dersê derxe. Piştî DAIŞ'ê çavkaniya hemû xirabî û êrîşên li dijî gelan bi pêş dikevin, dewleta tirk û çavsoriya wê ya ji bo van xewn û xeyalên xwe yên pûç e. Gefên di navbera Tirkiye û Îranê de jî, ji nêz ve bi vê mijarê ve girêdayî ne.

# Tecrîd astengkirina çareseriyê ye

Navenda Nûçeyan

**Li girtîgehan çalakiya greva birçîbûnê ku ji bo tecrîd û zextên li girtîgehan bi dawî bibin hatin destpêkirin didomin. Li aliyê din gel bi çalakiyên cur bi cur piştgiriyê dide grevê. Hat gotin ku tecrîd sûcê mirovahiyê ye û her wiha bi tecrîdkirinê rêyên çareseriyê tên astengkirin**

Çalakiya greva birçîbûnê ya girtiyên PKK û PAJK'î ku li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan, zêdetirî 100 roj in dewam dike. Çalakiya li Mexmûrê zêdetirî 80 roj û ya li Yewnenistanê jî zêdetirî 60 roj in didome.

HDP'a Amedê ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Ocalan û xwedîderketina li greva birçîbûnê ya li girtîgehan xwest li ber Peykerê Mafê Mirovan a Parka Koşuyoluyê daxuyaniyê bide çapemeniyê. Polîsan park dorpêç kir û destûr neda daxuyanî were dayîn. Girseyê jî bi çepik û tilîliyan astengî şermezar kir û çalakiya rûniştinê li dar xist.

**Dev ji tecrîdê berdin**

Endamên Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê Salîha Ceylan û Aygul Çiftçî piştgirî dan çalakiya grevên birçîbûnê. Ceylan wiha got: "Ocalan bi awayekî bêhiqûq tê ragirtin. Bi ser de jî tê tecrîdkirin. Dewlet, divê dev ji vê helwesta xwe berde. Divê rêya axaftinê vebike. Pêdiviya me ne bi tecrîdê, bi aştiyê heye. Em ne mirinê, divê em aştiyê biparêzin." Ceylan anî ziman ku divê her kes dengê xwe bilind bike û wiha got: "Divê kurd hemû rabin ser pêyan û li ber vê zilmê bisekinin."

**Daxwaz rewa ne**

Dayik Aygul Çiftçî anî ziman ku tecrîd sûc e li hemberî mirovahiyê û wiha axivî: "Ocalan demildest divê hevdîtinê bi malbata xwe û parêzerên xwe re bike. Tu hêleke hiqûqî ya vê tecrîdê tune ye. Pirsgirêk divê bi rêya axaftinê bên çareserkirin."

Aygul Çiftçî di dawiya axaftina xwe de got: "Heya ku daxwazên girtiyan neyên qebûlkirin divê her kes dengê xwe bilind bike."

**Mafên demokratîk**

Kemal Gur ku di sala 2018'an de li dijî tecrîdê 87 rojan di greva birçîbûnê de mabû wiha axivî: "Her kes, divê mafê xwe yê demokratîk bi kar bîne û dakeve qadan. Girtiyan, bedena xwe daye ber birçîbûnê. Ji lew re li derve neçareseriyek heye. Divê em piştgiriya vê îradeya muazam bikin. Ev daxwazeke insanî ye."

Gur destnîşan kir ku mirovan ji bo çareserkirina pirsgirêkê her tişt dane ber çavên xwe û wiha got: "Heger li welatekî hiqûq nemabe û îktîdar rabe qanûnên xwe binpê bike, wê ev wekî pêşerojeke baş nexuyê. Ocalan, dixwaze hemû pirsgirêk bi awayekî demokratîk bên çareserkirin. Tirkiye, mecbûr e ku Ocalan û hevalên wî esas bigire."



# Gelo Akbaşli hatiye kuştin?

Ramazan Akbaşli, di 19'ê mijdara 2020'an de bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" hatibû girtin û ew xistibûn Girtîgeha Wanê ya Tîpa F. Di 22'yê sibatê de jî hatibû derpêşkirin ku Akbaşliyê 55 salî întihar kiriye.

Piştî ku wî rakiribûn Nexweşxaneya Dûrsûn Odabaşi ya Zanîngeha Wanê, bi du rojan jiyana xwe ji dest dabû. Lê belê di rapora wî ya otopsiyê de hatiye tespîtkirin ku li stûyê wî dewsa daliqandinê tune ye, berevajî vê biniya singa wî xwînî bûye û li ser canê wî morbûn û reşayî hene. Malbata wî ji bo alîkariya di warê hiqûqî de serî li Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Şaxa Wanê da.

**Malbat dibêje xwe nekuştiye**

Malbata Akbaşli bi hinceta ku 'mafê jiyanê hatiye binpêkirin' serî li ÎHD'a Wanê da. Hevjîna Akbaşli Nemûş Akbaşli da zanîn ku lingê hevjînê wê bûye birîn û reş bûye. Akbaşli, bi lêv kir ku ev delîlên îşkenceyê ne. Akbaşli diyar kir ku hevjînê wê xwe nekuştiye û wiha got: "Berî ku bê kuştin bi rojekê ji bo ku parêzer biçin cem wî, telefonî me kir. Lê berî ku parêzer biçin xebera wî hat. Qethiyen hevjînê min xwe nekuştiye. Ew kuştin." Malbata Akbaşli jî ragihandin ku kesên "elemanên îstixbaratê" du caran di bin navê hevdîtina parêzer de çûne girtîgehê û hevdîtin bi Akbaşli re kirine û gef lê xwarine. *WAN*

# Li Wanê bertek nîşanî dorpêçê dan

Polîsan kolana Nacîbey a avahiya HDP'a Wanê dorpêç kir û nehiştin kes biçe HDP'ê. Parlamenterên bajêr Mûrat Sarisaç, Mûazzez Orhan û rêveberên partiyê, bertek nîşanî polîsan dan.

Sarisaç û Orhan xwestin ku bi rayedaran re hevdîtin bikin. Lê polîsên li ber avahiya walîtiyê, ew bi mertalên xwe dorpêç kirin û rojnamegerên xwestin bûyerê bişopînin, ji qadên dûr xistin. Sarisaç wiha nerazîbûnên xwe anî ziman: "Dixwazin komeke AKP'iyan bînin ber avahiya partiya me. Ev 5 sal in li vî bajarî, qedexe heye û vîna gel tê xespkirin. Aboriya bajêr, di rêzên herî dawî yên daneyan de cih digire. Di warê aborî, civakî, çandî û her qadê de, bajarekî têkçûyî heye. Em ê bi tu awayî li hemberî van bêhiqûqiyan serî netewînin. Walîtî neçar e ku vê rewşê ji me re îzah bike." Li ber avahiya walîtiyê çalakiya şermezarkirinê hat lidarxistin. Dema Sarisaç pirsên rojnamegeran dibersivandin polîs ketin pêşiya kamerayê û roportaj asteng kirin. *WAN*




# Helîkopter ket: 11 leşker mirin



Di 4'ê adarê de helîkoptera ku ji Çewligê bi hewa ket û çû çoltera gundê Şamîran a navçeya Tetwanê ya Bedlîsê ket xwarê. Fermandarê parartêşa 8'emîn korgeneral Osman Erbaş jî di nav de 11 leşkerên dewleta tirk mirin û 2 leşker jî birîndar bûn. Rayedarên dewleta tirk îdia kirin ku helîkopter ji ber şert û mercên hewayê ketiye xwarê. Leşkeran bi hinceta dê kavil bê rakirin û astengî çênebe, destûr nedan ku rojnameger û maşîneyên sivîl biçin cihê bûyerê. *BEDLÎS*

8'ê Adarê pîroz be!

Ji bo hemû cure cudakarî û tundiya fizîkî û psîkolojîk a li dijî jinan bi dawî bibin, em piştgiriyê didin têkoşîna jinan û 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê pîroz dikin.



ÇINAR BELEDİYESİ 1937

Şaredariya Çinarê û Endamên Meclisa Şaredariyê

REXNEDAYÎN: FÊRBÛN, AXAFTIN Û NIVÎSÎNA BI KURDÎ YE

# Kurdî wê bibe zimanê bingehîn

Felat Niştiman

*Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ji bo kar û barên zimanê kurdî, nexşêreya bi navê 'Nexşerêya Kurdî' amade kir û ji bo şopandina vê nexşerêyê Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî ava kir. Komîsyonê di çarçoveya nexşerêyê de, roja 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê dest bi perwerdeya kurdî ya navxweyî kir. Têkildarî nexşerêyê, komîsyona şopandinê, perwerdeya zimanê kudî ya navxweyî û hin mijarên din ên der barê ziman de, em bi parlamentera HDP'ê ya Amedê Dersim Dag re axivîn ku yek ji berdevkên Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî ye. Dag di hevpeyvînê de diyar kir ku parastina zimanê kurdî erka wan a sereke ye û ew bi xebatên xwe yên zimanê kurdî, hewl didin kurdî bikin zimanê bingehîn ê partiya xwe.*

**Partiya we HDP'ê, nexşerêyeke bi navê 'Nexşerêya Kurdî' weşand. Çi pêwîstî bi vê nexşerêyê heye û hûn dikarin hinekî behsa naverok û armanca wê bikin?**

Partiya me partiyeke pirdeng û pirreng e û dixwaze van deng û rengan biparêze. Her cudahiyek dewlemendiyek e. Dewlemendiyên herî mezin jî ziman bixwe ne. Li Tirkiyeyê bi sedan sal in, zimanê kurdan tune tê hesibandin û li ser zimanê kurdî polîtîkayên bişaftinê tên meşandin. Berpirsiyariya me ya herî mezin jî li hember van polîtîkayan, xwedîderketina li zimanê kurdî ye. Lê mixabin partiya me di vî warî de kêm ma. Ji bo em van kêmasiyên xwe temam bikin û zimanê kurdî bikin zimanê partiya xwe, me 'Nexşerêya Kurdî' amade kir û weşand. Li gor vê nexşerêyê;

-Ji bo xebatên kurdî bişopîne, li navenda giştî komîsyonek hat avakirin.

-Partiya me dê ji bo fêrbûna kurdî derfetan biafirîne.

-Ji bo ku komîsyonên li navenda giştî ya partiya me, bikaribin xebatên xwe û pêşkêşiyên xwe bi duzimanî bikin dê xebat bên kirin.

-Di nav her komîsyonê de ji bo kesek ji bilî axaftinê, bikaribe bi kurdî bifikire, binivîse û biafirîne, rêbazeke karîger dê bê diyarkirin.

**Ji bo şapandina nexşerêyê 'Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî' hatiye avakirin. Vê komîsyonê wê bi çi rol û mîsyonê rabe?**

Ji bo birêvebirina vê nexşerêyê me komîsyona şopandinê ava kir. Ev komîsyon ji 11 kesan pêk tê. Di vê komîsyonê de parlamenter, endamên Lijneya Birêvebirinê ya Navendî (MYK), Meclisa Partiyê (PM) û şêwirmend cih digirin. Ev komîsyon ji bo ku Nexşerêya Kurdî bi awayekî serkeftî were birêvebirin dê xebatên têkildarî zimanê kurdî bişopîne. Di heman demê de, di warê ziman de, dê polîtîkayên mayînde û domdar bi pêş bixe. Ev jî pêvajoyeke dûr û dirêj e. Ev komîsyon dê vê pêvajoyê bi rê ve bibe. Ji bilî wê, em dizanin ku li Tirkiyeyê astengiyên li ber zimanê kurdî sîstematîk in û sed sal in hene. Ji bo ku bikaribe li hemberî vê polîtîkaya bişaftinê bernameyeke parastin û bipêşxistinê bide ber xwe, wê dewlemend bike û polîtîkayên karîger têxe meriyetê, pêdivî bi avakirina komîsyona şopandinê hebû.

**We 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê, dest bi perwerdeya zimanê kurdî ya navxweyî kir. Em dizanin êdî derfetên fêrbûna zimanê kurdî zêde ne; çi li komeleyên zimanê kurdî çi jî bi awayê taybet kesên bixwazin dikarin fêrî kurdî bibin. (bi awayê online û rûbirû) We çima li nav partiya xwe dest bi xebata perwerdeya zimanê kurdî kir?**

Ji bo ku em li hember polîtîkayên bişaftinê xwedî li zimanê xwe derbikevin û seknekê nîşan bidin hewce ye ku berî her tiştî em bi kurdî biaxivin, bi kurdî bifikirin û bi kurdî bijîn. Me dît ku di nav partiya me de axaftin û jiyîna bi kurdî kêm e. Ji bo vê me biryar da ku em ji xwe dest pê bikin û me pêdivî bi hînkirin û hînbûna kurdî dît. Ji ber vê yekê me dest bi perwerdeya zimanê kurdî ya navxweyî kir. Niha bi giştî nêzî 600 hevalên me dest bi perwerdeya kurdî (kurmancî û kirmanckî) kir, di nav van kesan de hevserokên giştî, parlementer, rêveberên partiyê û şêwirmend hene.

Helbet me niha bi online ev bernameya perwerdeya navxweyî da destpêkirin, lê ev yek ji ber rewş û encama pandemiyê bû. Di rojên pêş de ku şert û merc guncav bibin, rê û rêbaza perwerdeyê jî wê cardin bê nirxandin.

**Em ji nêz ve dişopînin, hem li nav gel hem jî li ser platformên medyaya civakî, ji ber zimanê kurdî partiya we pir tê rexnekirin. Hûn ji bo van rexneyan çi dibêjin û çi bandora van rexeneyan hebû li xebatên we niha daye despêkirin?**

Her çiqas pirzimanî polîtîkaya me ya esasî be jî, di axiftina ji bilî zimanê tirkî de kêmasiyên me çêbûn. Rexneyên di vî warî de jî di cih dane. Bi rastî em jî rexnedayîna xwe didin. Armanca me ya herî mezin ya weşandina vê nexşerêyê û avakirina komîsyonê ew e ku em polîtîkaya xwe ya esasî bi cih bînin û rexnedayîna xwe bi fêrbûn, axaftin û nivîsandina bi kurdî bidin.

Ev pêngava navxweyî beriya her tiştî tesbîtkirina kêmasiya me ya zimanî ye, bi taybetî jî der barê kurdî de.



Ji bo birêvebirina nexşerêyê me komîsyona şopandinê ava kir. Komîsyon ji 11 kesan pêk tê. Di komîsyonê de parlamenter, endamên MYK'ê, PM'ê û şêwirmend hene. Ev komîsyon ji bo ku Nexşerêya Kurdî bi awayekî serkeftî were birêvebirin dê xebatên têkildarî zimanê kurdî bişopîne

Lewre jî ev gav gaveke pratîk e. Helbet ji bo vê pêngavê pêdivî tune ye ku gel û derdor jî me rexne bikin, parastin û bipêşxistina zimanê kurdî erka me ya sereke ye û deynê stûyê me ye li ber mîrasa me ya têkoşînê û gelê me.

**Medyaya dîjîtal derfeteke baş e ji bo zimanê kurdî lê em dibînin û dişopînin, piraniya parlameterên partiya we li ser hesabên xwe bêtir bi zimanê tirkî dinivîsin. (yên baş bi kurdî dizanin jî) Sedema vê çi ye, çima di vê mijarê de pêşengiyê nakin?**

Wek berê jî min anî ziman, rast e di hêla ziman de kêmasiyên me hene, rêvebir, xebatkar û parlamenterên me di hêla ziman de hewce ye bibin mînak. Mixabin zimanê siyasetê bi tirkî ye û em jî ketin nav vê çerxê. Yek ji armancên vê nexşerêyê jî ew e ku di her qadê de kurdî were bikaranîn û pêşvebirin. Ez bawer im piştî vê nexşerêyê dê kurdî di medyaya civakî de jî bêtir were bikaranîn. Dîsa di vê nexşerêyê de, tesbîtên bi vî rengî û rê û rêbazên ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê jî hatine kirin. Ev bernameya ku me daye ber xwe, beriya her tiştî di warê parastin û bipêşxistina zimanê kurdî de roleke sereke li rayedarên me bar dike û ji bo wê jî rêbazên berbiçav pêşkêş dike.

**Em dikarin bêjin bi vê xebata we re, wê zimanê kurdî bibe zimanê partiya we yê esasî?**

Wek hûn dizanin HDP partiyeke pirzimanî ye, lê heta niha bêtir tirkî dihat bikaranîn lê ji vê şûn de dê kurdî jî di her qadê de were bikaranîn. Dê tevahiya xêbatên me hem bi kurdî hem jî bi tirkî bin, yanî em dikarin bêjin kurdî dê bibe zimanê esasî.

Helbet gelek berpirsyariyên me yên dîrokî ji bo zimanên me hene. Lê divê em vê yekê zelal bikin ku pirsgirêka bişaftina zimanî, encama polîtîkayeke dîrokî û piralî ye. Sed sal in ev polîtîka tên meşandin û ji bo berterefkirina van polîtîkayan jî xebatên piralî ji me re pêwîst in. Ev nexşerê tenê rêbazek e û em li ser rêyên din jî di nav xwe de nîqaşan dikin.

**Beriya qeyûm tayînî ser şaredariyên HDP'ê bên kirin, li tevahiya şaredariyên HDP'ê xebatên çand, huner û zimanê kurdî dihatin kirin. Di van waran de, encamên berbiçav jî derketin holê. Bi qeyûman re, ew xebat hatin bidawîkirin. Li ser navê zimanê kurdî, çand û hunera kurdan çi hebe hat rakirin. Her wiha bi awayekî hemwext li tevahiya welêt polîtîkaya zext, zordarî û bişaftina li ser zimanê kurdî berbelav û kûrtir bû. Têkildarî vê rewşê çi gotinên we hene û li hemberî vê helwest û polîtîkaya we çi ye?**

Ji destpêka avakirina dewleta Tirkiyeyê heta niha, çend xalên bingehîn ên pergalê derdikevin pêş. Di nav onto-polîtîkaya dewletê de xaleke bingehîn jî têkbirina dewlemendiya zimanî û serdestkirina tirkî ye. Ji ber van polîtîkayan heta niha gelek ziman hatin hêrandin, bişaftin û di navbera nifşên axêverên wan zimanan de transfera zimanî hema hema qut bûye. Ji bo ku em bikaribin xetereya li ser kurdî jî bibînin û kurdî ji vê aqûbetê rizgar bikin, lazim e em nêzikatiya dewletê ya li ziman bibînin. Bi taybetî wextê em li encama sed salên dawîn dinihêrin, em dibînin ku ziman wek mijareke mihendisiyê, di avakirina nîzama siyasî û civakî de roleke sereke lîstiye û îro jî dilîze.

Beriya her tiştî divê em aşkera bikin, dewlet çawa nêzikî kurdan bûbe, wisa jî nêzîkî zimanê kurdî bûye. Polîtîkayeke yekpare ya dewletê derdikeve pêş ku ev jî ji bo fêmkirina zemîna rejîma qeyûman gelek girîng e. Rejîma qeyûman, amûrê herî berbiçav û aktûel a pergala dewletê ye ku xwe li ser dijberiya hebûna kurdan, îradeya kurdan, ziman û dewlemendiya kurdan ava dike.

Veguherîna pergala siyasî ya Tirkiyeyê, bi taybetî jî piştî sala 2015'an, bandora xwe herî zêde li ser rewşa kurdan kir û di encama wê de jî li ser zimanê kurdî kir. Kurdî bi temamî ji qada gelemperî hat bidûrxistin û krîmînalîzekirin. Di encama wê de jî kurdên ku li bajarên tirkan di jiyana xwe ya rojane de bi kurdî diaxivîn hatin qetilkirin. Ev tablo bi awayekî giştî nîşan didin ku ji bo dewletê zimanê kurdî, statûya wê, daxwaza fermîkirin û normalîzekirinê, li dijî kodên damezrîner a pergalê bûn. Lê ez ji vir dixwazim bînim ziman ku zext û zordariyên li ser kurdî û astengiyên li ber kurdî wê kurdan ji daxwaza wan a ziman bi dûr nexe. Çimkî daxwaza azadiya kurdî di heman demê de daxwaza azadiya kurdan bi xwe ye.

**8- Bi pêşengiya Platforma Zimanê Kurdî û Tora Çand û Zimanê Kurdî 'ji bo zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê' kampanyaya îmzeyan hat destpêkirin. Partiya we jî di nav vê xebatê de ye. Hêviya partiya we çi ye ji vê kampanyayê?**

Ji bo zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê, kampanyayek hat destpêkirin. Daxwazên me diyar in. Em dixwazin wek her gelî, bi zimanê xwe perwerde bibin. Di demeke kurt de bi hezaran kesan îmze kir û piştgiriya xwe diyar kirin. Ev jî nîşan dide ku gelê kurd di vê daxwaza xwe de çiqas bi biryar e. Helbet dê ji bo ziman xebat û hewldanên me bidomin. Em ê di her qadê de têkoşîna ji bo ziman bilind bikin û wek vê kampanyayê, kampanyayên cur bi cur bidin meşandin, di qada navneteweyî de jî ji bo teşhîrkirina nêzîkatiya Tirkiyeyê ya li dijî kurdî dê xebatên me hebin. Ji bo ku ev kampanya belav bibe û têkeve rojeva me, em ê hemû derfetên di destê xwe de bi kar bînin. Daxwaza fermiyet û perwerdeyê daxwazeke giştî ya gelê kurd e. Ji bo ku ev daxwaz bê qebûlkirin, ev kampanya jî wek rêbazekê ye, lê em ê van rêbazan dewlemend bikin.


## Dersim Dag kî ye?



Sala 1996'an li navçeya Bismilê ya Amedê ji dayik bûye. Beşa kurdolojiyê ya zanîngeha Artûklûyê xelas kiriye. Hîn xwendekarê zanîngehê bû, di hilbijartinên parlamenteriyê yên sala 2018'an de, wek parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Amedê hat hilbijartin. Dag yek ji parlamenterên herî ciwan e û hevberdevka Komîsyona Şopandina Nexşerêya Kurdî ya HDP'ê ye.

# Keleha Çeqçeqo

**Kelehek li delavê Dengiza li ser têketina rêya Kunfir heye, navê wê keleha Çeqçeqo ye, newala piştî wê jî newala Çeqçeqo ye. Gelo em çiqas axa pîr û kalan, erdnîgariya ku em li ser dijîn nas dikin?**



Ji Delav
Feratê Dengizî

Bi dorfirehî dixwazim qala wê keleha li Delavê Dengiza ya bi navê Çeqçeqo û pê re jî ya derdorê bikim û êdî rista dîrokzan û arkeologan e.

Pêşî qala derdorê bi gelemperî bikim. Ji biniya keleha Çeqçeqo Govê dest pê bikim ku ev der bajarekî kevn e, şikeft tê de hene, xeşîba ji kelehê tê û diçe ber avê. Ji Govê û heta Stewrê (*Savura Mêrdînê*) 5,5 km ye. 500 metre nêzîkî Delavê Dengiza ye, ji navenda Mêrdînê ber bi Bakur ve 41 km ye. Ji Govê heta Stewrê, derdora çend malên me yên Delav jî tev bermayî ne, nav kîjan rezî, bin kîjan hîmî bikolî nalên hespan, gem, şerbikên biçûçik ên tije ax, zincîrên hesin dertên. Dîsa ji Stewrê ber bi bakur, ber bi Bismilê ve jî, nezîkî 10 km tev warên kevnare ne.

Ku te xwe ji Eynûnê (*bi erebî Kaniya Biçûk*) ya ber Stewrê bi Bakur ve berda, Ehmedî (*Başkavak*) gundekî kevn ê şên, xwedî pireke kevnare ye, jê û wir ve çemê Romanî bi nav û deng e, romî demeke dirêj li vir serdest bûne, dêra Romanî hê jî li ser lingan e. Dîsa Sîspan: Navê Newala Çemê Romanî / Newala Sîspanê li aliyê rastê çav dibiriqîne, Şerê Sîspanê, Şerê Newala Sîspanê: Di navbera ereb (*misliman*) û romayiyan (*xaçparêz*) de, şer li vir çêbûye, derdora B.Z 700'î, dibêjin xwînê gewdeyên mirovan li ber xwe birine, pir şerekî dijwar bûye.

Em rêwîtiya xwe bidomînin. Jê pê ve çemê Xanê dest pê dike ku xana wê şikefteke mezin a di ber çemê Stewrê de ye.

Li vir divê qala rê bikim, rêya Hevrîşimê (*Îpek Yolu*) bi nav û deng e. Zivistanê di deştê, warên germ, havînê di çiyê warên hênik re dibuhurî. Îca şaxek vê rêyê ji Cizîra Botan berê xwe dida Hezex-Midyat-Qiltê (*Dereiçi gundekî Stewrê yê suryanan e, paşê ez ê li ser çend peyvan bikim*)-Stewrê-Kela Pozreş-Dêrbendê-Xanoserê-Tepê-Bismil-Diyarbekir. Ji Stewrê pê ve rê bi ber çem re didome.

Em li çemê Xanê, domdariya çemê Romanî mabûn.

Em çem û çem herin, em ê di ser pira Hebîsê ya kevnare re herin keleha Pozreşa (*hin xwecih dibêjin Keleha Pezreşa-Hîsarkaya*) li ser latekî wek Amedê ye, Amedeke biçûk e. Li jêra wê xanek mezin hebûye, karwanan li vir bêhna xwe didan, dîsa rêbira li vir kar dikir, mirov dikare bibêje herêma Barava û ya Dêrevera bi rêbiriya vir xwe xwedî dikirin. Dîsa heta çend sal berê ev der rêya qaçaxçiyan bû, licî, liciyên qaçaxçî pir li vir hatine şêlandin. Dîsa ev keleh, girê Dêrbendê û Tepê dibîne ku di demên kevnare de têkiliyek xurt a ber bi qiraxrê Dîjle heta Mûsilê diyar dike. Rewşa Xanoserê (*Xana Ser, a mezin-Başhan*) jî hêjayî lêkolînê ye ku ev der warekî kevnî ye, ne xalî ye.

Ka em vegerin Stewrê. Lewra Stewrê navenda vî warê ku mirov dikare bibêje; daîreyek e ku nîvdaîra wê 10-15 km ye.

Mijara Stewrê dirêj e, bi çend peyvan em dikarin qal bikin. Piştî Tizyan (*Elmabahçe*), di dema Mûradê 4'emîn de bûye navçe lê weke war pir kevn e, belkî ji Mêrdînê jî kevntir be. Navê wê jî balkêş e; bi suryanî "*Staora*" tê wateya "*Stû*" bi rastî jî erdnîgariya wê wek stûyê hêştirê (*deve*) ye. Keleh serê devê û cihê ku jê re bi erebî dibêjin "*kambûzê*" jî (*hawîd-horguç*) ê devê ye. Dîsa hinek dibêjin ji navê fermandarê Îskender Stoar tê. Gelek şîrove hene; dibêjin bi kurdî jî ji navê xwedawend Star-Stêrk tê, lewra Stewrê stêrka derdorê ye, xwedawend nedizewicîn "*stewr*" bûn! Her çiqas niha ji ber polîtîkayên rê ew li qoziyekê hatibe jibîrkirin jî, xezîne-gencîneyek çandî, mîmarî, dîrokî, turîstîkî û muzeyek vekirî ye.

Îca ku tu ber bi rojhilat, ber bi Midyadê ve herî, piştî 10 km'yan tu yê gundekî suryanan ê qedîm bibînî; Qilit-Qiltê. Warekî zêde kevn e, li zinar û tehtên derdorê şikeftên serdema kevirîn hene, mezelênqebrên di tehtan de jî. Sûka wê bi mirov dide zanîn ku serdemekê navendek gelek girîng bûye, dikanên sinetkarî her çiqas wêrane bin jî, balkêş û cur bi cur in. Her wiha navenda xaçperestiyê ye; du manastirên bi hêbet li ser rê-kaşa gundê Memikan (*Yaylayani*) hene. Rez, erd û bihîvên wan zindî ne. Dibêjin yek ji manastira ku zêde wêran nebûye, xwedî 360 menzalan e. Belê, hê jî dêrên her sê terîqetên wan; katolîk, ortadoks û protestan wek ku nipînû bin û ya katolîk çalak e, tûrîst tên serdana vir, heybeta dêra hestin bandor li ser mirov dikin, jiyan û mirovahî balkêş e lê devjêberdanî ye. Mirovahî zêde pesindar e lê wehşet bi modernî û herawayî didome û pêkarî her tim rewa ye!

De ka em vegerin Çeqçeqoyê, ji Stewrê ber bi rojava ve.

Wexta ku Tizyan navçe bû, rêya ku ji Cizîrê dihat Stewrê, şaxek rê berê xwe dida Tizyanê. Di delav re rê berê xwe dida newala Çeqçeqo ya pişt keleha Çeqçeqo. Newal tev teht-rizde û hîm in ku karwan diket vê derê çeqeçeqa dengê nalê wan olan dida, (*wexta ku min bi ciwanî neql ji girê Şêran dikişandin, dengê simê heywanên me jî heman olan dida wek dengê lingên qantirên êzingvanên stewriyan, lê zeman û dîrok bêbext û bêbersiv! çeq-çeqçeq.*) dengê lingên ajalan çi hêştir, hêstir, hesp, ker dibû mîna aşê cinan, deng digiha ezmanan. Loma navê newalê ma newala Çeqçeqo û eynî nav da kelehê, keleha Çeqçeqo. Îca newal pir dûr û dirêj e, rê bi ziyareta Kero, Sarîca Hecî Izer û Qûçê, Qûça Mirîda didome û digihê Bakustan, bi Bernişt re rê digihê Tizyanê, berê ev rê zêde dişuxulî, nifşê me jî bû şahid, lê zeman, ax zeman. Kî dizane li ser vê rêyê çi bû çi qewimî, evînî, xapinî, diz û tolazî, rêbirî. De zeman û xweza ker e! Belkî çendî dergevanên kelehê di taveheyvekê de keça mîrê kelehê revandibe û xwe avêtibe bextê mîrê keleha Pozreşa yan jî Elmedîna. De bila ev jî di veşariya zemanê bêbext de bifetise. Her ku li pozê keleha Çeqçeqo dinêrim, nizanim çima evînek bêhêvî erîşî dil û mejiyê min dike. Ew bi ber heswê xwe sipartiye rima xwe, simbêlê xwe badide û nifir an jî çêran dide çerxa felekê. Di ber xwe de diminminîne belkî;

*Ne firikek, dilopek av dixwazim*
*Ne jî gezikek, gepek nan*
*Zeman*
*Zeman dixwazim*
*Ax zeman, afirînêr, bexîl û bêwijdan*
*Mifteha jibîrakirinê di dest de*
*Qadê dixwaze*
*Ku kabê te mîrnehat*
*Herê zeman, ax zeman.*

Mirov dikare bibêje vê çembera mîrateya çandî-dîrokî hêja ye û keleha Çeqçeqo wek têketina bajarekî ku van gişkan dixe nav xwe. Çeqçeqo deriyê ewlehiyê bû, karwan, her kî çi be bi destûra wê derê ancax daxilî wê axê bibûna, keleha nobedar, dergevan û asiya ewlehiyê bû!

Beriya ku biqedînim divê qala rêyek dinê ya vê axê bikim. Rêyek ku nifşa diya min jî ji bo guhertinê bi kar dianî. Ji Mêrdînê ber bi bakur ve, Zinarê-Xişxişokê-Şatih-Barman-Girê Şêran-Şewlê Hacikê-Newala Kelê-Girikê Izêr, xwe digihand Elmedîna, Elmedînaya li kêleka çemê Batmanê, biniya pira Batmanê ya niha, ji pirê heta girê Sîra. Di dema Bavê Ehmed pêşiya Eşîra Riman (*Ramanî*) de jî ev bajar tije şênî bû, li dar bû. Hê gelek mirovên baravî-surgicî, nexasim şûtî û dêrîşî dibêjin qeyda me li ser Elmedîna bû. Tê bîra min kalikê min Hecî Izêr di sitranekê de digot, "*Berê bavê Nûrê li Elmedîna li bajêr e, di heqîba wî de sêsed zêr e.*" Ne şaş bim, niha xeta boriya gazê ya ku ji Batmanê tê Mêrdînê heman guzergah e.

Dixwazim bibêjim ev axa candar tije mîrateya çandî ye jî.

Bendewarê lêxwedîtiyê ye.

Ax û welat bendewar in!

**Têbinî:** Dibe ku hin şaşî-kêmanî hebin, lêborîn her daîmî ye.. Mirovên xwedî agahî divê li ser axa xwe binivîsin. Lewra serdest me nanivîsin!



# Zarokên dîsleksî û pîtol



Amed Tigris

Dîsleksî zehmetî û astengiyên hînbûna zarokan e. Zarokên ku dîsleksî bin dereng dest bi axaftinê dikin. Dema dest bi axaftinê bikin jî di dengderxistin û axaftinê de zehmetiyan dikişînin. Nexweşiyeke zarokan a wiha ye ku dema zarok hîn biçûk in, mirov tê dernaxe. Dîsleksî ne kêmbûna zekayê ye. Zarokên dîsleksî ji aliyê zekayê ve tu kêmasiya wan tune ye. Bi tenê di xwendinê de zehmetî dikişînin. Tîp, kîte û peyvan bi rêzê re nikarin bibînin û bixwînin. Carnan şaş dixwînin û carnan jî bi ser hinek kîte, peyv û hevokan re baz didin ango rast naxwînin. Di polê de li pey hevalê xwe dimînin. Dema dixwînin eciz dibin, ji xwendina xwe fêm nakin. Nikarin konsantre bibin û serê wan diêşe.

Çend cureyên dîsleksiyê hene. Ji wan cureyan du jê yên gelemperî û bingehîn in. Yek jê norolojîk û ya din jî fonolojîk e. Ev her du jî di zikê diya xwe de ji ber sedemên fizyolojîk ên mejî çêdibin. Di mejî de arîşe peyda dibin. Cureya sêyem jî dikare piştî bûyînê ji travma û nexweşiyan çêdibe. Ev cure dîsleksî dikare hem di temenê zaroktî û hem jî di temenê mezintiyê de pêk were.

Mixabin tedawiya nexweşiya dîsleksî tune ye. Zû teşhîskirin girîng e. Li welatê pêşketî zû teşhîs dikin. Bi gelemperî zarok dema dest bi zarokxane û dibistanê pola yekem dikin, mamoste li ser rewşa zarokên xwe radiwestin û heke şagirdên wan ên dîsleksî hebin, mamoste, rektor û dêûbav li gel hev tedbîr digirin û demildest serî li bijîşkên taybet didin. Zarokên dîsleksî diçînin dibistanên taybet. Li dibistanên taybet ji bo zarokên dîsleksî, programên taybet hene. Perwerde û hîndekariya wan li wir li gorî wan programan dom dike.

Li welatên paşvemayî piraniya dêûbav û mamosteyan ji nexweşiya dîsleksiyê ne agahdar in. Dema zarok sala yekem dest bi dibistanê dikin, hemû zarokan dikin polek û perwerde ji bo her kesî ye. Mamoste dersa xwe dide, êdî kî fêr bû û kî fêrnebû. Yên ku nikaribin bixwînin, hem derb dixwin û hem jî bi ser re gotin dixwin. Tên mobîngkirin. Teşhîsa zanistî tune ye, lê ew zarok bi du gotinên hevpar tên sûcdar kirin: "Tembel û kêmaqil in."

Min bixwe li Amedê 7 sal û li Stockholmê jî 25 sal mamostetî kir. Li Amedê gelek şagirdên min hebûn ku heta pola pêncan nikaribû bi awayekî rast û serûber çend hevokan bixwînin. Dema min digot, "bixwîne," dikirin inteint û kuftekuft, nikaribûn bixwînin û digotin, "serê min dêşe." Min jî wek mamosteyên din teşhîsa xwe ji bo wan ji sedî sed dabû: "zeka kêm e, kêmaqil e..." Min ji dêûbavê wan re digot, "serê zaroka we naxebite, loma nikare hîn bibe..."

Li Swêdê çend şagirdên min ên kurd hebûn, dema dest bi dibistanê kiribûn teşhîsa wan a dîsleksiyê hatibû kirin û ew şandibûn dibistana taybet. Ez di hefteyê de carek diçûm wê dibistana taybet û dersa wan a kurdî dida. Ew zarok dema dipeyivin ji zarokên din biaqiltir û zîrektir bûn, lê dema min digot, "haydê em dersê çêbikin", nedixwestin. Gelek caran min ji wan re dixwend û wan li min guhdarî dikir. Piştre min dipirsî "ka we çi fêm kir?" Bawer bikin ji şagirdên min ên ku li dibistanên normal bûn baştir fêm dikirin.

Zarokên dîsleksî bêtir dixwazin tiştên pratîk bikin, yên ramanî û ne teorîk. Bingeha dibistanên wan jî li ser pratîkê hatine avakirin. Li cîhanê ji dîsleksiyan gelek mirovên pîtol (zîrek, dahî) derketine ku dîroka mirovahiyê, şaristaniyê, guhertine. Ji wan kesên dîsleksî yên navdar çend jê ev in: Einstein, Edison, Pablo Picasso, Leonardo Vinci, Mehmed Eli Keîra, Orlando Bloom, Patrick Dempsey, Steven Spielberg, şahê Swêdê Carl Gustav.

# 8'ê Adarê: Sembola nirxdayîna keda jinan e

**Îro 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê ye û li gelek deverên cîhan û Kurdistanê tê pîrozkirin. Jinên kedkar der barê vê rojê de axivîn û diyar kirin ku ev roj sembola jinên kedkar e**

Navenda Nûçeyan

Di her çîrokeke jinekê de, hem serkeftin hene hem jî êş, tunehesibandin, hepiskirina di malê de û kolekirin hene ku ji aliyê hişmendiya serdest ve bi dîrokeke qerase hatiye avakirin. Em tev dizanin ku bi hezaran sal in, jin di her qadê de tê eciqandin û keda wan tê binaxkirin.

Bi munesebeta 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê, me berê xwe da hin jinên di qadên cuda de dixebitin.

**Li Rojava barê du qat**


Nûrşan Hisên

Nûrşan Hisên a ji bajarê Efrînê ye, ji sala 2012'an ve li Rojava di nav xebatên civakî de cih girtiye û niha di xebatên dîplomasiyê de wek nûnera Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li başûrê Kurdistanê de cih digire.

Hisên têkildarî zehmetiyên ku di qada siyasetê de jiyane wiha got: "Li aliyekî diviyabû em xebatên Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi rê ve bibin û li hember zihniyeta rêjîma Baasê têbikoşin, li aliyê din jî diviyabû em li hember kevneşopiyên civaka xwe ya ku bi hêsanî hezim nake jin bikeve qada siyasetê, têbikoşin. Ji bo wê jî barê li ser milê me jinan du qat giran bû. Yek ji prensîbên Rêveberiya Xweser a Rojava pergala hevserokatiyê bû, lê belê gelek astengî û zehmetî hatin beramberî me. Ji ber ku zihniyeta zilamperestî ya bi salan e xwe berdaye nav rehên civakê, konsepta parvekirinê napejirîne. Parvekirin jî yek ji bingeha demokrasiyê ye."

Nûrşan Hisên diyar kir ku Roja Jinên Kedkar a Cîhanê sembola nirxdayîna keda jinan e û ev tişt anî ziman: "Êdî tê zanîn ku cîhan bi hezaran salan wekî cîhana zilaman hatiye birêvebirin. Nijadperestî, olperestî, zayendperestî û gelek pirsgirêkên binyadî yên civakê weke encamên vê zihniyetê derketine û bûne sedema şeran û kuştinan. Li milekî din gelek pirsgirêkên xeternak di xwezayê de derketine, em wekî mirov di roja me ya îro de li hember hawirdorê bûne sûcdarên nayên efûkirin û jiyana zindiyan ketiye metirsiyeke cidî û nexweşiyên biyolojîk her diçin zêde dibin. Ev hemû encamên jirêderketina nirxên civakê yên exlaqî ne."

Hisên ragihand ku nivîsandina dîroka azadiya jinan li ser milê civaka kurd berpirsyariyeke exlaqî, bi taybetî berpirsyariya jin û ciwanan e û wiha domand: "Ne tenê ne 8'ê Adarê, divê hemû roj ji bo me bibin rojên têkoşîn û xebatê, divê em weke jin di vê prensîbê de gavan bi paş de navêjin û rojane di avakirina dadweriya civakî de afirîner û xwedî raman bin. Birêz Abdullah Ocalan nexşerêya azadiya jinan bi kûrahî daniye û weke fîlozofê azadiya jinan di nav gelan de hatiye naskirin. Ji bo wê jî, ramanên wî ji bo me jinên kurd bûye weke xeteke jêneveger."

**Jin di qada hunerê de...**


Emîne Şîlan Yuksekkaya

Hunermend Emîne Şîlan Yuksekkaya jî bi salan di nav Koma Azad de cih girtiye. Wê kedeke mezin daye muzîka kurdî û hê jî wek hunermendekê karê xwe didomîne. Şîlan Yûksekkaya der barê zehmetiyên dijîn de wiha got: "Tê zanîn ku bi hezaran sal in, jin di her qadê de hatiye tunekirin. Yek ji van qadan jî qada hunerê ye ku zihniyeta mêran xwe wek pêşengê hunerê dibîne û hemû amûrên hunerî li gorî xwe bi kar tîne. Huner li ser axa Mezopotamyayê bi giştî bi destê jinan hatiye afirandin. Ligel hemû zehmetiyên ku hişmendiya serdest li hember hunera me, zimanê me ava dike wek her jineke kurd ez jî li ber xwe didim. Ya rast dema min nû dest bi muzîkê kir di serî de li dijî hişmendiya baviksalariyê min li ber xwe da. Nêzîkatiyên 'dê jin çawa derkevin ser dikê' jî hebûn, helbet min ev zehmetî tev dan pêşiya xwe û dest bi hunerê kir. Nêzî 25-30 sal in li dijî hişmendiya baviksalar bi stran û sekna xwe têdikoşim."

Yuksekkaya têkildarî wateya 8'ê Adarê got ku diyarkirina tenê rojekê ji bo jinên cîhanê ne di cih de ye û ev tişt anî ziman: "Îro jin di her qadê de xwedî kedeke giranbuha ne, her roj li ber xwe didin, geh li malê, geh li derve, geh di nav hunerê de yanî roja jinên kedkar tenê ne rojek e her roj e."

**Mêr xwe xwedayê malê dihesibînin**


Esen Saçik

Esen Saçik jineke ciwan û dayika 4 zarokan e. Ew di temenekî biçûk de zewiciye û berpirsiyariyên kar û barên malê yên giran girtiye ser milê xwe. Ew jî yek ji wan jinan e ku bi darê zorê hatiye zewicandin. Saçik der barê jiyana xwe ya rojane û kar û barên malê de wiha axivî: "Em di malê de ji aliyekî ve karên malê yên rojane dikin, ji aliyekî ve berpirsiyariyên zarokan dişopînin û ji aliyekî din ve jî gotinên rojane yên dema bavê zarokan dibihîzin. Bi rastî jî karên rojane ji bo mêran pir hêsan xuya dibe û jixwe mêr wek ku 'jin di malê de tu karî nake, jin ji bo karê malê hatine afirandin' mêze dikin. Ji bo çi? Ji bo ku ew bixwe çend quriş pere tînin malê xwe wek xwedanê malê dihesibînin. Em tim di nav derûniyeke bi vî rengî de û rastî muameleyên xirab tên. Ji bo vê yekê jî hewce ye jin serî li ber mêran netewînin. Em jin in, bila mêr bi çavên xizmekaran li me nenêrin. Ev pirsgirêka herî mezin a jinan e."

Saçik di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser zehmetiyan û wiha got: "Derketina derve wekî diyariyek e ji bo min. Em jî carna bi hêrs dibin û dixwazin bi tena serê xwe bimeşin ji karê malê û ji derdê zarokan hinekî dûr bikevin lê mixabin ev jî ji aliyê civakê ve dibe pirsgirêk. Ji ber tirs û xofa mêrên qirêj em newêrin bi tena serê xwe derkevin. Pirsgirêk ne derketina min a derve ye, pirsgirêk hişmendiya mêran e. Mêr ji aqilê jinan ditirsin û dixwazin bi hêza xwe ya fizîkî jinan têk bibin. Siyaseteke qirêj di jiyana jinan de didin meşandin. Em ê vê nêrînê bişkînin û nêrîna civakê ya negatîf a li ser jinan biguherînin."

Her wiha Esen Saçik ji bo roja 8'ê Adarê jî dest nîşan kir ku di her şahî û çalakiyên 8'ê Adarê de ruh û berxwedana jinan a kolektîf heye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "8'ê Adarê avakirina têkoşînê ye, nirx û keda jinan e. Di bingeha têkoşîna 8'ê Adarê de ruhê wan jinên ku ji aliyê mêran ve hatine şewitandin heye, ji ber wê 8'ê Adarê ji bo min gelekî bi wate ye. Ez bi rêzdarî wan jinan bi bîr tînim."

**Divê ev roj bibe her roja jinan**


Cîhan Bîlgîn

Cîhan Bîlgîn nêzî 5 sal in li Rojava rojnamegeriyê dike û şahidiya şoreşa jinan dike. Cîhan di axaftina xwe de bal kişand ser berxwedana jinên li Rovaja û ev tişt anî ziman: "Tişta herî balkêş li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, rojane 8'ê Adarê ye. Ji ber li gor wateya wê rojê jin di nav têkoşîn û berxwedanê de ne. Her çiqas êrîş û gef li ser herêmê berdewam bikin jî sekna şêniyan zelal e. Her wiha vê têkoşînê bandoreke mezin li hişmendiya mêran jî kiriye. Ev têkoşîn bi salan e berdewam dike û ne bi hêsanî hatiye vê astê. Gelek berdêl hatin dayîn û hêj tên dayîn lê hatiye wê astê ku êdî her kes berê xwe dide herêmê û li ser berxwedana jinan û şoreşê filman û stranan çêdikin, pirtûkan dinivîsin."

Bîlgîn diyar kir ku ji bo jinan 8'ê Adarê girîng e lê tişta herî girîng jî her roj bi ruhê 8'ê Adarê xwe tevlîkirina berxwedana gelan e û wiha domand: "Ne tenê rojek her roj roja jinan e. Bi berxwedanên gelek mezin ev roj hat ragihandin. Rojeke dîrokî ye lê sînordarkiria wateya azadî, têkoşîn, berxwedana jinan a tenê di vê rojê de, armanca dewletan e ku bi hişmendiya zilam tevdigerin. Li dijî hişmendiya zilamperest, bidestxistina rojekê bo jinan serkeftinek e lê wateya wê rojê di hemû rojan de belavkirin esas e."

Cîhan Bîlgîn têkildarî zehmetiyên ku wek jinek rojnamger rû bi rû dimîne jî ev tişt anî ziman: "Di êrîşên dewleta tirk a li ser herêmê de, zehmetiyên herî mezin rojnamegerên vir dijîn. Li herêmê di dema şopandina şer de, rojnameger yekser hatin hedefgirtin. Di êrîşan de gelek hevalên me yên rojnameger jî şehîd bûn. Ez wan bi bîr tînim. Her wiha di dema êrîşan de şebekeyên telefonan hemû tên sekinandin ku jî bo heqîqet neyê ragihandin. Ev jî ji wan zehmetiyan e. Lê erka sereke bi rêya wêne, foto yan jî nûçeyan ragihandina van hovîtiyan e. Ev armanc nahelê ku ez winda bibin."

**Di sendîkayê de jin**


Hediye Güneş

Hediye Guneş sosyolog e û li TUM-BELSEN'a KESK'ê ya şaxa Mêrdînê sekretera jin e. Guneş ragihand ku rêxistinbûna sendîkayî ya jinan ji bo tevlîbûna wan û wekheviyê girîng e û wiha got: "Tê zanîn ku qada sendîkayê wek qada mêran tê pênasekirin. Bi vê yekê ve girêdayî, jin di vê qadê de jî tune tên hesibandin û hejmara jinan di vê qadê de kêm e. Yên heyî jî bi meaşekî pir kêm dixebitin, di karên bêkêr de di bin şert û mercên zor de dişixulin. Ji bo vê yekê jî di qada sendîkayê de jin xuya nabin. Tevlîbûna karên sendîkayê tê zanîn ku piştî mesayiya kar dest pê dike lê ji ber ku kar û barên malê jî wek 'karên jinan a yekemîn' tê hesibandin mêr xwe wek hakimê vê qadê dibînin. Ji bo vê jî jinên ku di vê qadê de xwe bi rêxistin kirine zêde nayên hezkirin."

Her wiha Guneş diyar kir ku hem li qada sendikayê hem jî li her qadên jiyanê jin li her deverê cîhanê li ber xwe didin û 8'ê Adarê li hemû jinên kedkar pîroz kir.



# Du hefte bi çalakiyên jinan derbas bûn



Navenda Nûçeyan

Her sal jinên kurd û cîhanê li her derê 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê beriya du hefteyan bi coşeke mezin pêşwazî dikin. Beriya du hefteyan jinan starta çalakiyên 8'ê Adarê dabûn û heta 8'ê Adarê bi çalakiyên cur bi cur banga tevlîbûna çalakiyan kirin.

Îsal jî jin beriya du hefteyan dest bi xebatên xwe yên 8'ê Adarê kirin. Bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê jin bi pêşengiyaTevgera Jinên Azad dest bi xebatên xwe kir. Her sal li Bakur starta çalakiyan li bajarekî Kurdistanê tê dayîn. Îsal jî starta çalakiyên 8'ê Adarê di 26'ê sibatê de bi dirûşma 'Li hemberî qirkirina jinan jiyanê û li hemberî tecrîdê azadiyê diparêzin' li navçeya Hezexa Şirnaxê hat dayîn. Di axaftinên startê de bang li hemû jinan hat kirin ku di 8'ê Adarê de li qadan bin û wiha hat gotin: "Ji bo ku em sedsala 21'emîn bikin sedsala jinan, em bi îdiaya mezinkirina têkoşînê 8'ê Adarê li qadan bin. Em hemû jinan vedixwînin qada têkoşînê. Em bang li jinan dikin ku xwe birêxistin bikin û li dijî her cureyên tundiyê li gel me cih bigirin. Têkoşîna me bi pêşengiya Sarayan dest pê kir û dê bi berxwedan û têkoşîna wan bidome."

Piştî starta TJA'yê li Hezexê, li bajarên din ên Bakur ji Botanê heta Serhedê, Amed, Êlih, Riha û hwd. jinan starta çalakiyên 8'ê Adarê dan destpêkirin. Li bajaran çalakiyên civîna jinan, qertşandina ji bo jinên girtî, belavkirina qurnefîlan, şahî û hwd. pêk hatin. Di hemû çalakiyan de bang li hemû jinên kurd û Kurdistanê hat kirin ku roja 8'ê Adarê de dakevin qadan û daxwazên xwe qîr bikin.

Wekî ku di dirûşma TJA'yê jî tê xuyakirin, yek ji daxwazên jinan ên di tevahgiya çalakiyên 8'ê Adarê derketin pêş rakirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bû. Li gelek navendan jinên kurd bi coşeke mezin, bi cilên xwe yên gelêrî û bi daxwaza azadiyê û rakirina tecrîdê daqetin qadan. Her wiha di çalakiyan de jin daxwazên xwe yên sereke anîn ziman û peyama domandina heta gihîştina azadiyê dan.



Yasemîn Elban

# Serkeftina jinan

Ev demek e em ketine serdema pêvajoya 8'ê Adarê. Çima dibêjim pêvajo? Lewra 8'ê Adarê êdî ji bo jinan jî, ji bo serdestan jî bûye pirsgirêkek mezin. Bûye nakokiyek antagonîst. Ango kêşeyeke zor û zehmet. Bûye mijara tekoşîn û berxwedanê. Jin çiqas li ber xwe didin û doza mafê xwe yê xwezayî dikin, serdestiya mêranî jî ewqas jop û mertalên xwe tûj dikin û li hember wê berxwedana jinan xwe radikêşin.

Serdestiya hişmendiya mêranî bi wê hêşmendiya xwe ya hezaran salan çiqas bixwaze bide meşandin jî, roj bi roj li hember jinan kozikên xwe winda dike û roj bi roj hêz û erka wê lawaz dibe. Bawer im ku dê ji vir û bi şûn de hîn bêhtir winda bike û jin wê her sal bêhtir pêş ve herin. Rast e, jin van salên dawî bi taybetî welatên wekî Tirkiye, Îran û her wekî din belkî zêde tên kuştin, lê ev yek bi awayekî zelal tê xuykirin ku êdî rewşa jinan, berxwedan û tekoşîna jinan hatiye guherandin. Jin êdî tenê parastinê nakin, jin êdî îro hatine radeya doza wekhevî û azadiyê.

Di sala 1857'an de 8'ê Adarê ji ber ku jinên kedkar mafê xwe yê xwezayî xwestin, bi hovîtî 129 jin hatin şewitandin. 53 sal bi şûn de xatûna bi navê Clara Zetkîn ji bo ku ew bûyera xembar neyê jibîrkirin 8'ê Adarê roja bîranîna wan îlan dike û ev yek tê pejirandin. Lê heta roja îroyîn jî ev roj ji hêla hişmendiya serdest a mêranî ve zêde nehatiye pejirandin û hîn jî ev doz bi sernavê 8'ê Adarê bi gef û gur bi zor û zehmetî didome. Heta serkeftin û wekheviyê dê bidome jî û bi ser jî bikeve. Divê di vê der barê de şik û gumana tu kesî tunebe.

Îro wekî ku Karl Marx gotiye: "Tenê fêmkirin û têgihîştina dinyayê têrê nake, divê dinya bê guherandin." Jin tenê rewşê fêm nakin. Dilê wan heye ku dinyayê jî biguherînin. Dilê jinan heye ku reng û dengê dinyayê, rewş û tîmtêla dinyayê bikin reng û rewşa bihuştê. Dixwazin cîhanê bikin baxê îrem. Dixwazin dinyayê wekî navê xwe bikin rengê jînê, rengê keskesorê.

Sal bi sal, roj bi roj guherîn çêdibe, dinya diguhere, zagon diguherin, fikir diguherin, urf û edet diguherin. Jin jî diguhere, jin çiqas diguhere, mêr diguherin. Lewra her çiqas neyê dîtin û neyê pejirandin jî loqomotîfa jiyanê jin in. Jin dinyayê diguherînin û dê biguherîne…

Ji 1857'an heya niha gelek guherîn çêbûn, mirov pêre pêre bi guherînê nehese jî lê gava mirov li rewşa jinan a beriya 50 salan dinêre mirov dibîne ku jin bindest bûne, hele hele mafên keçan qet tunebûye. Keç bi emrê biçûk, pîrî caran dihatin firotin. Ger zava ji gund bûya qelenê wê zevî bû, lê zava ji gundekî dûr bûya qelenê wê pere bû.

Mafê keçê tunebû ku heya şeva xewletê zava bibîne. Ew bi qedera xwe ya nenas ve rû bir û dima. Ka gelo zava yekî kal e, kor e, keçel e an topal e. Ji xwe ji bo keçikê pirsgirekeke mezin jî şeva xewletê bû, keçika hîn zarok, hîn xeşîm bi kesekî nenas re li ser çiftexasê spî û qerqaş…

Piştî ku keçik dibû bûka malê, erê, navê bûkaniyê li ser bû, lê çi bûk çi hal! Ew bi fermî dibû koleya malê. Heya wextê razanê bê sekin kar û barên malê dikirin. Xesû, xezûr, tî, û dişê jî ew biçûk dikirin û heqaret lê dikirin. Mêrê bûkê, çi wext kêfa wî bixwesta beleheq, belesebep li jina xwe dixist.

Gava bûka malê zarok bianiya, hemla wê keç bûya, ew biçûk dikirin û kîjan gotinên nexweş hebûn jê re dihatin gotin. Eger du yan jî sê hemilên wê keç bûna, vê carê mafê wan hebû ku hêwiyê bînin ser. Berê halê jinê ev hal bû…

Jinê tim li ber xwe da; bi sebir bi hêza xwe ya piçik piçik ve, çawa ku deriyekî pola bi derziyekê kun bike, mafê xwe girt û bi ser ket. Îro li hemû dinyayê jin hev digirin û piştgirî didin hev.

Lê jinê di vê demboriyê de, li hemberî vê neheqî û bindestiyê serî rakir, li ber xwe da, bi sebir têkoşiya mafê xwe bi dest xist û bi ser ket. Îro roj, jinên xwende û şareza, li her qada jiyanê cih girtiye, bûne serokê şaredariyan, serok û hevserokên partî û rêxistinan; bajar û welatan bi rê ve dibin. Jin bi hunera xwe, bi hunermendî û bi deng û awazên xwe, dinyayê dixemilînin. Jin bûne nivîskar, hespê xwe di nav wêjeyê de dibezînin; bûne avahîsaz avahiyan saz dikin; bûne wekîl parlamentoyan dihejînin; bûne bijîşk jiyanê didin giyaneweran; jin wekî her carê bûne mamoste, dinyayê hînî mirovahiyê, hînî zanist û jiyanê dikin.

Mixabin tevî van serkeftinan jî, li gelek deveran jin hê jî tên kuştin û tundî li wan tê kirin. Berê, bav û birayan jin ji ber namûsê dikuştin. Lê niha gelek ji wan êdî şareza ne, xebatkar in, xwedî pîşe ne, aboriya xwe bi destê xwe xistine, li hemberî neheqiyê serî radikin, bi çarenûsa xwe qayil nabin, bi hêza xwe hesyane û dikarin çarenûsa xwe biguherînin. Vê carê jî ji aliyê mêrê xwe yan jî dergistiyên xwe ve tên kuştin.

Divê êdî serdestiya mêrane vê baş fêm bike; berê jinan li ber xwe dida ku hîn bêhtir nehqî li wan nebe, lê îro rewş guheriye. Îro jin li ber xwe didin û têdikoşin ku wê sazûmanî, cendere û serdestiyê biguherînin. Jin êdî dixwazin dinyayê biguherînin.

Di van rojên pandemiyê de, me ji ajnasan gelek bûyerên nexweş bihîstin. Lê ji bo vê yekê jî hêvîdar im; yekbûn, hevgirtin û piştgiriya jinan dê pêşî li van bûyeran bigire û fikrên van mêrên li ser jinan cebrê dikin biguherînin.

Çawa ku jinan navê jînê, navê jiyanê hildaye ser xwe, dê vî navî li hemû mirovahiyê belav bikin û dinyayê biguherînin. Ev hêza jinan heye. Jin wê afirîneriya xwe dîsa berdewam bikin û dinyayê ji bo mêran jî xweş û geş bikin. Lewre mêr hevjînê jinan e.

Ez bawer im, jin dê dest bavêjin mêran û wan jî ji wê bîra reş û tarî derxînin û rengê keskesorê bidin wan. Dê mêran ji vê pergal û hişmeniya ceberût û zalim azad bike û bîne ser dîwarê mirovahiyê. Ev sebir, hêz û vîna jinan heye. Sedrestiya mêranî belkî hîn jî ev yek fêm nekiriye, lê wê fêm bike û wê bê ser tasê, bê ser agosê. Bila her kes vê bizanibe û bila her kes jî vê bawer bike.

Belê, jin dixwazin dinyayê bi rengê xwe biguherînin. Rengê jinan, rengê jiyanê ye. Lewre rengê jinan ne rengekî ji rêzê ye. Rengê jinan ne rengekî hêsan e. Ger jiyan di dinyayê de tişta herî girîng be, rengê jinan jî rengê jiyanê ye. Madem bingeha dinayayê li ser afirandinê ava bûye, jixwe rengê jinan rengê afirandinê bixwe ye. Wê demê divê hemû mirovahî bipejirîne ku divê dinya bi rengê jinan bê xemilandin. Lewre ew rengê eşqê ye, ew rengê dayikê ye…





Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Roja nan û gulê, şer û şahiyê

Mirov dikare têkiliya yekser û rasterast a di navbera têgehên wek "bindestî, tekoşîn, serkeftin û şahiyê" di gelek bûyerên dîrokî de bibîne. Ger mirov bi awayekî mantiqî li van têgehan û rêzbûna wan a dîrokî binihêre, pêvajoyeke sîstematîk derdikeve pêşberî me: ango li dijî bindestiyê têkoşîn tê meşandin û di dawiyê de serkeftin tê pîrozkirin. Lê em bi taybetî ji dîroka xwe ya kurdan jî dizanin ku ev yek wisa ne hêsan e û li gorî rêzê nameşe. Di navbera van têgehan de têkiliyeke tevlihev heye, her tim li gorî rêzê nameşin, carinan çend xal bi hev re derdikevin qadê, an jî berevajî tên jiyîn an jî hin jê nabin mijar.

Ligel vê hin roj hene ku ev her çar têgeh bi carekê ve û bi hev re dikevin rojeva mirovan. Roja 8'ê Adarê jî rojeke bi vî rengî ye. Çar demsal di rojekê de tên jiyîn. Ev rewş bandora xwe li daxuyanî û amadekariyan jî dike. Daxuyanî bi pênasekirina êrîşan dest pê dikin, bi têkoşîna li dijî bindestiyê berdewam dikin, serkeftinên heyî binxêz dikin û di dawiya daxuyaniyê de vê rojê li hemû jinan û zayendên bindest pîroz dikin. Em binêrin li qadan jî rewş ne cuda ye: Li hêlekê ve bi şahî û coşê 8'ê Adarê tê pîrozkirin, li hêla din êrîş li ser jinan tên kirin, li dijî vê jin natirsin, serî natewînin, xwe diparêzin; dawiya rojê em bi wêneyên ji her têgehî, 8'ê Adara salê bi dawî dikin.

Ji bo bernameya radyoyekê ku dê roja 8'ê Adarê weşaneke taybet ji bo roja jinan çêbike, ji guhdaran hat xwestin ku wateya 8'ê Adarê –berê û niha- ji bo xwe pênase bikin. Jineke ciwan di bersiva xwe de gotibû; "Diya min roja 8'ê Adarê gul wek diyarî digirt, herhal wek spasî ji bo koledariya xwe. Lê bo min roja 8'ê Adarê roja şer, hêrs û tekoşînê ye."

Ligel wateya xwe ya berevajîkirî "gul" di sedsala 20'an de ji bo jinên têkoşer bi wateya li dijî mêtingeriyê dihat bikaranîn. Tevgera jinên karker û sendîkavan bi dirûşma "jinên karker nan jî dixwazin gulê jî!" derketibûn qadan û ji bo destheqeke wekhev (nan) û jiyaneke birûmet (gul) têkoşiyan. Ji sala 1912'an vir ve ye dirûşma "em nan jî dixwazin gulê jî" ji hêla tevgera jinên karker ve wek sirûda 8'ê Adarê tê pejirandin. Bêguman jinên kedkar "gul û nan" ji kesî nedixwestin. Jiyaneke wekhev û birûmet mafê wan bû û ji bo jiyaneke bi vî awayî têdikoşiyan.

Lê piştre "gul" ji hêla serdestan ve bi fêlbazî û wek pêçeka durûtiya serdestan/mêran ku qaşo evîndarî û spasdariyê temsîl dike, bû alava kapîtalîzmê. Gul bû sembola "tu yan a min î, yan jî ya axê!" Di destê kujer, serdest û mêtingeran de xwîn êdî ji pelên wê dirijiyan. Her wiha nan hîn jî di devê şer de ye û bi taybetî ji bo jinan têkoşîna li dijî kapîtalîzmê ku jinan wek çîna qada herî binî dibîne û li keda wê dimije, sembolîze dike.

Di berevajîkirin û pûçikirina wateya nirxên mirovahiyê de, ji serdestan hostetir kes tune ye. Lewma jî 8'ê Adarê ji bo jinan û zayendên bindest di heman demê de roja xwedîderketina li nirxên xwe ye. Ji ber vê yekê ye ku jin bi gul û nanê xwe yê di tûrikê xwe de derdikevin qadan û beyî ku wan ji serdestan/mêran bixwazin, li hev par dikin. Hemû derewan aşkera dikin: Evîna ku dikuje binpê dikin, dewleta bavik û mêtinger teşhîr dikin, bedena xwe ya dorpêçkirî azad dikin, malbata kujer red dikin, rengên qedexe li esman bilind dikin.

Teşhîrkirina pergala baviksalar û li nirxên ku hatine berevajîkirin ji nû ve xwedîderketin bêguman dilêriyeke mezin divê û ev yek ji hêla jinan û rêxistinên wan ve di asteke bilind de tê pratîzekirin. 8'ê Adarê lûtkeya vê xuyabûn û xuyakirinê sembolîze dike. Ji ber vê yekê ye ku çiqas asta teşhîrê û xwedîderketinê bilind dibe, beramberî vê asta êrîşan jî ewqas bilindtir dibe. Bi ser de vê têşhîr û tekoşînê bi coş û şahî bi pêş xistin, bi al û kincên kesk û sor û zer, bi rengên keskesorê, bi muzîk û stranan pêşwazî kirin û li hemberî sînorên zayendperestiyê meydan xwendin efendiyên şerên reş û tarî yekcar çavsor dike.

Ya ku 8'ê Adarê bi serkeftinê sertac dike û efendiyan dilerizîne jî piştgiriya bêsînor a jinan û zayendên bindest û her wiha hevkariya tekoşînên cuda ye. Ev yek e ku tekoşîna tevgerên jinan niha wek tekoşîna herî xurt û çalak a li seranserê cîhanê pênase dike.


Em jin ji dîroka ku ji me hatiye dizîn jî pir tişt hîn bûn. Me têkoşîna xwe bilindtir kir. Me serî li ber serdestî û mêtingeriyê netewand. Me dek û dolabên wan li wan vegerandin. Nirxên xwe ji destên wan girtin. Em niha doza qadan, kuçe û kolanan dikin. Roja 8'ê Adarê temsîla têkoşîna bi vî rengî dike. Em êdî ne ji nan û gula xwe, ne jî ji şer û şahiya xwe gav paşde navêjin. Roja 8'ê Adarê, roja li dijî bindestiyê, roja têkoşîn, serkeftin û şahiyê li me pîroz be.

# 8'Ê ADARÊ *LI HEMÛ* *JINÊN CÎHANÊ* PÎROZ BE

- ♀ Bi baweriya me ya bi têkoşîna jinê ya bi çirûskan mezin bûye û bi meşaleyan ronî kiriye;
- ♀ Ji bo maf û jiyana xwe,
- ♀ ji bo daxwaza edaletê,
- ♀ ji bo azadiya jinên siyasî yên girtî, li dijî talana xwezayê û ji bo parastina ekolojiyê,
- ♀ ji bo  îstîhdamê, ji bo mafên me yên ku hatine xespkirin em careke din bi dest bixin,
- ♀ ji bo em ji rejîma qeyûm re bêjin êdî bes e,
- ♀ li dijî faşîzma ku jiyana me dorpêç kiriye û li dijî polîtîkaya tecrîdê bi şiyara

**BI BERXWEDANÊ JIN DIMEŞIN AZADIYÊ!**

**EM HER DEVERÊ VEGUHERÎNIN QADÊN 8'Ê ADARÊ**




HDP KADIN MECLİSİ

# Tekoşînê cenîyan ê veralejê camerd û dewlete

Meral Ozel

Her cayê dîna waxtê lejî de en jede cenî û domanî benê hedef. En jede cenî feqîrîye oncenê, vesan manenê û rastê taciz û tecawizî yenê. Hefteyanê pêyenan Yewbîyayena Miletan serva dugela Yemen jû vengdayîsî de lezîn kerd. Rîwalê polîtîkayanê hukumdaran ra cenî û en jede kî domanî xizanîyî oncenê. Hukumdarî, dewletî ya kî jû nameyî da bîna camerdî ke dewletan, hukumatan temsîl kenê iyê. Coka avê herîş kenê, dime ra kî serva rindeyî onca vejîne meydan. Xo jê wayirê însonîye misnenê. Hama pêro dîna de kewt ke jû lej esto, uca de nî dewletî, nî camerdî estî. Şîddet û qetlîyamê cenîyan nî lejan ra cîya nêno destguretene. Name nî herîşan lej o. Lejê camerdan ê vera cenîyan.




Tarîxê dîna de zaf nûmûneyî estî. Waxtê Herbê Dîna yê Diyene de cenî her hetî de qirkerdene ra ameyî ravernayene. Japonya cenîyê ke hesîr guret bazaran de rot. Kore ra hata Vîetnam, Çîn, Bangladeş cenî rastê tecawizî ameyî. Nî lejan de tecawiz kî je tifong ardiya kar ardene. Onca Efrîka de bi des serrano cenî rastê tecawizî yenê. Kampanê mûxacîran de ya kî hardanê xo de.

Coka sîstema camerdan û sîstema dewlete je jûbînî. Pêro mesajanê nî herîşkaran de seweta cenîyan tewayî de rind çîn o. Serranê pêyenan de cenî hetê na sîstema camerd-dewlete ra zaf hetî ra cerîna binê zorvajiye.

Bi hazaran serro cenîyan ser zilm, nêqediya. Cenî zerrê çeyan de, cayî kar de, mektev de, kuçeyan de son-sodir, kam ci seate bena va bibo ya şiddet vînena ya kî yena kistene.

Serra 1857'î de cenîyê kedkarî, emegdarî yê konfeksîyônî verva bêadaletî vejiyayî, serva ciwîyayîse rind, serva debara rinde dest kerdê tekoşîne. Beno ke dîna de sifte virene tekoşîna de bi rêxistin yê cenîyan ke na wa. Hama camerden wastisanê cenîyan rê cewab bi heriş dayî. Cenî ke grew de bî, zerrê palkade çeber serrî yenan de guretî. Palgade vesayîs vejiya û 129 cenîyanê emegdaran rê bî mezele.



Na roze jê roza tekoşînî, jê haqanê xo rê wayir vejiyayene yena qebûl kerdene. Cenî teyna 8'e Adare bimbarek nêkene, na roze de pêro piya benê jû vera sîstema camerd-dewlete vindene.

Serra 2020'î ra heta ewro nî polîtîkayî herîşkar bî jede. Haqe cenîyanî ke bi tekoşînî guretî, na sîsteme wazena ke destê cenîyan ra peyser bicero. Çar hetê dîna de cenî serva haqanê xo, seweta azadîya xo tekoşîn danê, jûbînî rê paşt vejînê.

Tekoşîn û xoverdayîşê cenîyan ê vera na herîşkarîye her waxte ra jedena beno girs. Na 8'ê Adare de na raştiye vejiye werte. Omêdê cenîyan yeno diyayene. Çiqas kî wastî çalakîyanê cenîyan tomete bikerî, vengê cenîyan bibirne, nayî de sernêkewtî.

Cenîyê kurdî, teyna serva kamayîsê xo nê pêro piya serva xelesîyayîşê qomê xo tekoşînê xo kenê berz. Bi qerarîya tekoşînê xo yê azadîye de wayîr vejine. Coka roza ma yê ewroyîne de temsîlkarê sîstema netew dewlet cenîyan, gencanê kurdan hedef cena. Zonenê xelesîyayîşê cenîyanê kurdan, xelesîyayîşê pero kurdan o. Cawo ke azadîya cenîyan esta, uca de avêr şîyayîs, uca de dewlemendîye, uca de aştîye bena.

8'ê Adare roza cenîyanê emegdaran, cenîyêke erzenê xo ver, cenîyêke tekoşîn danê, cenîyêke wazenê xo zilm ra bixelesnê sima pêrone rê bimbarek bo.

# Bimiro koletî, biciwîyo azadîya cinîyanê emegdaran

Mehmet Seyîtalîoglu

Marksîzm nêmyê sedserra 19. ra dima zaf kesî binê tesîrê ci de mendî. Çimke hem felsefeyê xo bîye hem kî wayîr îdeolojî bî.

Marksî vat bî; 'zaf kesa felsefa xo bîye. La ez bedilnayîşê (vurnayene) dinya dano xo ver. Bitore sîsteme de newe ronî.' Gore Marksî tarîxê komelî, sinifa ra mucadela nînan ra awan bîya.

Tarîxa netewîya de deme feodalîte ra dima nara kî kapîtalîzm îstîhsal xo de sinifî awan kerd. Feodal îstîhsal û kapîtalîst îstîhsal mabêne înan de diwar çîn o. Jubînî ra durî nîyê. Bineawanî û serawanîya xo modernîte de benî cîya. Sinifê nê pergala (nîzam) gore xo yê.

Netewîya ma de qalê senî sinifa bikîme? Hem şîkîn îme qalê komela feodalîte hem kî qalê komela kapîtalîstîyê bikîme. Sera ser no tahlîl xo ser babet yo.

Netewîya ma giranîya xo komela feodalîte ser yo. No kifşkerdîş ciwîna şarê ma de xo ano ca. Ma heywandarîye û citkarîye kerda. Tarzê ciwînîya şarê ma, kultur û exlaqê ma no tore dewam de bîyo awan. Qalê cite û cobarî de, qalê hêgayan û cuwenî, heywanan û şiwanî û gawanî her û estorî ben o.

Dewan de axayî û şiwanîyeyî û dewijan têhet de ciwîyene. Axa arazî ra dewletî yo. Zaf dewijî bê arazî yê. Şiwaney bê par ê. Axa qet nêxebetîyenê, û alûver de herçîye xo mikem o. No ruwal ra mabenê şiwanî axayî de mucadele esto. No mucadele şiwanî û axayî îdeolojîyê marksîzmî de ca gureto. Ma vajîme peynîya peyenede hetkarê şiwanîyeyî dest na mal û milkê axayî ser. Şiwanî axayî ca vurna. Taba çîye çareser nebeno.



Eger şiwane dest dano ser, mal û milkê axayî keno muşterek dewe mîyan de, ameyoxe rind noro. Mordem tenya bi mal û milk neben o serdest. Otorîte kî lazim o.

Ti vajê dewe mîyan de oyo ke bindest bî, şiwanê tenya yo?

Ez vana balê xo bido cinîyan ser. Çeye şiwanî û çeye axayî û çeye dewijan de kî cinîy bindest e. Û biney otorîteya camerdan de ya.

Marksî û marksîstan halê cinîyan nedî yo. Tim çimey înan sinifî û mal û milkî sero yo.

Vurnayena dinya lazim o, ebe no çim tede nîyaderîme. Vurnayena (bedilîya) bi hêq û huqûqê cinîya çîna uca adalet awa nêbeno. Her komelî de bindestî estê. La cinî bindestê bindestan a.

Azadîya ke cinîy bê pare manena, bêbextîya û zura.

Îtîqatê netewîyan de cinî çeberê estbîyayîşîye. No hard û azmen, dar û ber, çucik û masî, cirm û cîhanî ûsn bi kilmekî çebere estbîyayîşîya.

Makî bergurêtîşa. Makîye rojbîyayîşa. Makîye çebere des û heşt hazarî alemê. Çar anasira de xo dana we. Hard û azmên, awe û adir de esta. Makîye azad ke nêba ruye harda ra qêt çîye azad nebeno.

Bimiro koletî. Biciwîyo azadîya cinîyanê emegdaran ya cîhanî.



Dewey Ma
Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Edaletê Xoceyê Xasî

Mîyanê ma kurdan de, deştan de şarî pez kerdêne weye, la dewanê mîyanê koyan de dewarî kerdêne weye. Zehfê ci zî serê keyî yew-di mangay bî. Înan qeybî qatixî, mast, şit, rûn, çî anayînî, qeybî kê xo, kerdêne weye. Dewicê ke feqîrî bî, nêşkayêne pere bidê gawanêke, belkî hewce zî nêkerdêne, bi dewre şîne verê heywanan. Her keye rocêke ê heywanê dewe berdê ko, çerenayêne û şande açernayêne keye.

Amed de qezaya Licêy esta. Licêy de zî dewêke bi nameyê Hezanî esta. Qehremanê ma Xocey Xasî Hezan de niştê ro. O biaqil bî. Her wext ê rey dayne vernî merdiman. Zehf merdimî şîne het û çîyan te ra pers kerdêne, şêwrê xo kerdêne.

Rojêke rojan ra dewrey gawanî yena Xocey Xasî ser. Xoce wirzeno we heywananê dewican dano vernî xo û kuno rey go bero ko. Tay şino, dewicêke hawneno Xocey Xasî dimay dewarano û hano go bero ko, înan biçerêno. O xo bi xo vano, “Xocey ma çawey şoro verê dewaran, eyb o.” Vaz dano şino verê Xocî, dest erzeno çiway ê, wazeno te ra bigîro û vano:

- Xoce, vinde ez verê to ra şorî verê heywanan.

Xoce vano “Nê, dewrey min a, ez do şorî.”

Mêrik qebûl nêkeno, vano “Xoce wele eyb o, ma tîya bin, ti şorê verê heywanan.”

Xoce vano, “Çi rê eyb o, dewrey min a, ez do şorî.”

Yew ê ra, yew ê bînî ra, bi yewbînî nêkenê. Mêrik vano îlla ez do veray to şorî verê heywanan. Xoce zî joy xo ra nîno war.

Dima ra Xoce hawneno çare çinîyo, mangay xo mocneno ra ê û vano: “Serê sibay mast û şîtê ene manga to werd ya mi?”

Mêrik vano, “Helbet to werdo.”

Xoce vano, “Madem serê siba mast û şîtê cay mi werd, ez do şorî verê heywanan.”

Dimay ene joy ra mêrik îqna beno û Xoce şino verê heywanan.

Enka çi rê ma ene mesela arde ziwan?

Xocey Xasî roja 18'ê sibatê 1951'inan de merd. Tam bî 60 serre merdo.

Xocey Xasî bi namey xo Mela Ehmedê Xasî serrey 1867 an zî 1868'inan de hamew dinya. Bi eslê xo eşîrey Zîktî, dewey Xasan (ene dewe mîyanê Dara Hênî û Licêy de wa) ra bî. La ew bi xo Hezan de hamey dinya. Gorey vatişan ra ê miftiyê Amedî Hecî Îbrahîm Efendî ra îcaze giroto. Dima ra ê wendiş dewam kerdo û îcazeyê şêxîtî zî giroto la qet şêxîtî nêkerdo.

Xocey Xasî mewlûd açernabî kirmanckî (zazakî) ser û o bi ene xebatey xo yeno naskerdişî. Ew dew de, dewanê Licêy de zey merdimêke bi aqil, adil û zana hamew naskerdişî. Serrey 60'inan ê wefatê ci de ma bi hurmet ci anê vîrê xo.

## Dîtina te bi sed kerî ye

**Behlûl ji hevjîna xwe re got:** Sibe ez ê biçim bazarê kerekî bi kirim.
**Hevjîna wî got:** Bêje înşallah.
**Behlûl got:** Çima ez ê bêjim, pere di berîka min de ye û ker li bazarê ne.
Bû sibeh çû bazarê, bazar gelekî bi xirecir bû.
Kerek dît bi xwedî re bazar kir û li hev hatin.
Destê xwe kir berîka xwe, lê berîk vala bû, ji ber ku dizekî jê dizîbû bê ku bixwe bihese.
Behlûl bi dilekî şikestî vegeriya malê.
**Hevjîna wî jê pirsî:** Ka ker?
**Behlûl got:** Vê sibehê ez ji malê derketim înşallah.
Ez çûm bazarê înşallah.
Min kerek dît înşallah.
Min bazar kir înşallah.
Min destê xwe kir berîka xwe înşallah.
Dizan pere jê dizîbûn înşallah.
Û ez vala vegeriyam cem te înşallah.
**Hevjîna wî got:** Tu bi xêr û xweşî hatî înşallah.
Dîtina te li cem min bi sed kerî ye înşallah.

*Cemal Dêrgulî*




## Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-**Mamê Mino mamanî
Buxçika çekê mekê ji xwedê pê ve kes nikare vekê?
De bêjin ev çi ye?"

**2-**Tiştek min heye
Cihê sima gayekî hinga dinyayekî

**3-**Tiştek min heye
Çala li pişt xaniya
Ket destê zebaniya

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**

**1-** Jina bi halekî, ducaniya jinê
**2-** Gêrik, morîstan
**3-** Tenûr

## Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Sêsed û şêst û sê şemî**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Sî û sê şimik li serşokê**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
**Şeyê te şûva şe dike**

***Çavkanî: Zûgotinok***
***Berhevkar: Mihemedê Kurdo***



## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Ne çêbûyî, ne keliyayî 3. Çemekî gelekî dirêj ê Misrê
5. Reqis 6. Boriya sobê 7. Tiştê ku pê devê ker û hespan dihate girtin
9. Çiyayekî Kurdistanê 12. Hinek jê re dibêjin befir
14. Xwelî 15. Navê rewşenbîrekî navdar ê Filistînê ……Saîd
17. Cejin 18. Rojeke hefteyê
22. Bê mebest

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Birayê dayika mirov
2. Navê meşa girtiyan a li zindanê
3. Bersiva neyînî 4. Noteke muzîkê
5. Kaş, cihekî bilind
7. Çiyayekî Kurdistanê
8. Zilam, her wiha wêrek
10. Kêlek, tenişt
11. Bajarekî bakurê Kurdistanê ku bi sûrên xwe û dîroka xwe bi nav û deng e
13. Şerm 14. Ezman
16. Sûret, resim
19. Hundir
20. Heywaneke bi saw ku navê qralê daristanê lê tê kirin
21. Cînavkeke pirhejmarî
23. Ser û çav

Bersiva hefteya borî



# Di karê weşangeriyê de cihê jinan

Bêrîvan Kayi

**Têkildarî jinên karê weşangeriyê dikin û zehmetiyên di vê qadê dijîn de, em bi xwediya weşanxaneya Payîzê Serdem Kahraman û yek ji xwediyên Pirtûka Kurdî Berfîn Huseynî re axivîn**


Serdem Kahraman


Berfîn Huseynî

Dîroka serdestan çawa ku jin di warên polîtîka, felsefe, spor, huner, dîplomasî û hwd. de tune hesibandine, di warê wêje, nivîskarî û weşangeriyê de jî ev nêzîkatî xwe berdewam kiriye, ji ber ku ev qad tim wek karên entelektuel ên mêran hatine hesibandin. Tê zanîn ku dîroka çapxaneyê ya modern di salên 1440'î de li Ewropayê dest pê dike lê helbet beriya wê bi gelek teknîkên cuda nivîs hatine nivîsîn û berhem hatine belavkirin.

Li gor agahiyên heyî, li Kurdistanê jî di sedsala 19'emîn de karê weşangeriyê belav dibe û bi taybetî jî bi destên cemaetên olî û derdorên xiristiyan hatine avakirin. Ji ber vê jî pirtûkên kurdî bi taybetî li derveyî Kurdistanê wek Kahîre û Stenbolê hatine çapkirin. Helbet armanca me ne ew e ku em qala dîroka çapxaneyan bikin. Di qada weşangeriyê ya kurdî û giştî de ev kar tim wek karekî mêran hatiye lansekirin.

Têkildarî mijara ku jin di nav weşangeriyê de xwedî cihekî çawa nin em bi yek ji xwediyên weşanxaneya Payîzê Serdem Kahraman û yek ji xwediyên Pirtûka Kurdî û weşanxaneya Darayê Berfîn Huseynî re axivîn.

**Damezrandina Payîzê**

Serdem Kahraman piştî ku zanîngehê qezenç dike êdî têkiliya xwe ya bi zimanê tirkî re ji holê radike û berê xwe dide ziman û wêjeya kurdî. Kahraman ji bo ku ji karê pirtûkan hez dike di hin weşanxaneyan de wek alîkar dişuxule û piştre jî biryara damezrandina weşanxaneya bi navê Payîzê dide. Salek berê weşanxaneya Payîzê hat damezrandin û niha ew jî yek ji şîrîka weşanxaneya Payîzê ye. Êdî ew di nav vê qada ku ji aliyekî ve ziman û pirtûkên kurdî tên tunehesibandin ji aliyê din ve jî tunehesibandina jinan a di qada weşangeriyê de ye.

**'Hejmara mêran zêdetir e'**

Kahraman der barê qada weşangeriyê de da zanîn ku di vê qadê de hejmara mêran pir e, mêr derdikevin pêş û wiha got: "Lê ev nayê wê wateyê ku jin nikarin vî karî bikin û di qada wêjeyê xwe îfade bikin. Mînak ez bixwe li ser medyaya civakî gelek caran rastî nêzikatiyên zilaman tim, ji vê rewşê jî pir aciz dibim. Helbet ev nayê wateya ku dê bi karê wêjeyê ve eleqedar nebim. Çawa ku nivîskarî û karê weşangeriyê li jinan tê û dikarin bikin. Karê weşangeriyê jî bi vî qaydê li jinan tê û dikarin bikin jî. Bi ya min wêje bêhtir li jinan tê, dema jin binivîsin û karê weşangeriyê bikin bi dîsîplîn û profesyonelî dikarin nasnameya xwe ya wêjeyê bi dinyayê bidin nasîn."

**Mînakek ji dîrokê**

Serdem Kahraman di axaftina xwe de bal kişand ser qedexekirina qada wêjeyê li jinan û wiha pê de çû: "Di serdema Victoryayê de edebiyata îngilîzî ji jinan re hatibû qedexekirin û ji bo vê jî jinan xwe dixist şiklê mêran û bi vî awayî berhemên xwe çap dikirin, bi wêjeyê ve eleqedar dibûn, dinivîsandin. Dikarim çend navan jî ji wan bidim 'Malbata Brontê' di sedsala 19'emîn de ev çend xwişk bi wêjeya îngilîzî re mijûl bûne û niha jî li dinyayê tên nasîn. Weşangerî jî tiştekî wiha ye, dema meriv bi hesteke xurt û bi xwe bawer bikeve rê dê mirov bikaribe karê xwe bike û xwe îfade bike."

Kahraman ragihand ku ew bi gelek jinên nivîskar, helbestvan, wêjevan, dîroknas û hwd. re tim di nav têkiliyekê de ye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Yek ji wan jinan jî Leyla Saraça ku di girtîgehê de ye û me pirtûka wê ya bi navê 'Werzeba'yê çap kir. Wekî din jî berhemên wê hene em ê li ser wan jî bisekinin. Di her karî de ji bo jinan zehmetî hene bi rastî, karekî ku meriv bi rehetî bike tune ye."

**'Di her qadê de mêr li pêş in'**

Berfîn Huseynî ji Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Artûklûyê mezûn bûye û niha şirîka Pirtûka Kurdî û weşanxaneya Darayê ye. Huseynî der barê karê xwe de diyar kir ku wek her qadê di qada weşangeriyê de jî mêr li pêş in û wiha got: "Em berê xwe didin kîjan qadê, weşangerî, rojnamegerî, nivîskarî û hwd. tim mêr derdikevin pêş. Ev jî mîna ku em hemû dizanin ji ber vê yekê ye ku ruhê jinan, xeyalên jinan û xwebûna jinan ji zaroktiyê ve bi dîwarên stûr tê pêçandin û ev yek bandora xwe li hemû jiyana jinan dike."


**'Li benda wijdana mêran nemînin'**

Huseynî di axaftina xwe de da zanîn ku her diçe jin di her qadê de gavên sexlem diavêjin û ev tişt anî ziman: "Jin êdî sînorên ku li pêşiyê hatî avakirin yek bi yek ji holê radikin û bi keda destê xwe jiyaneke jinwarî ava dikin. Ji vir wê de jî ev yek bi têkoşeriya jinan re eleqedar e. Çimkî ger jin li benda wijdana mêran û civakê be dê tu serkeftinek bi dest nexe. Ya min jî ev sala sisêyan e ku bûme şirîka Pirtûka Kurdî û li wir dixebitim. Wek mînak dikarim xwe jî nîşan bidim bo bidestxistina qadên ku mêran cihê xwe lê qehîm kiriye. Piştî xelaskirina zanîngehê gava min xwest bibim şirîka Pirtûka Kurdî malbat li dijî vê yekê derket û bi tu awayî nebû destek. Lê min gelek rîsk dan ber çavan û bi hezar zor û zehmetiyan ez bûm şirîk û niha wek jin tenê ez di nav şirîkan de cih digirim û ez ê hewldana xwe bidomînim."


# 8'ê Adarê pîroz be!

Ji bo em sedsala 21'ê bikin sedsala jinan, bi MEZINKIRINA îdiaya xwe, ji bo 8'ê Adarê bi azadiyê bixemilînin, her qadê bikin qada têkoşînê, her beş û neqşên civakê veguherînin, em bang li jinan dikin ku xwe birêxistin bikin. Têkoşîna me bi dîroka xwe, wek Sara û hezkiriyên wê berxwedana mezin û bi têkoşîna azadiyê çawa ku şoreşa jinan pêk anîn, em ê têkoşîna jinan a cîhanê MEZIN bikin...

Bijî 8'ê Adarê!
Bijî Berxwedana Jinan!
Jin Jiyan Azadî!



TJA Tevgera Jinên Azad
Tevgera Jinên Azad



# Xebatên cuda mijarên hevpar

Navenda Nûçeyan


Li Amedê ji bo 8'ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê pêşengehek ji aliyê Komeleya Çandê ya Mezopotamyayê ve hat lidarxistin. Di pêşengeha ku bi xebatên Neşe Toprak, Zozan Bor û Fîgan Ektî ve hatî amadekirin de jinan bi navê xebatên 'Ked', 'Hêvî' û 'Jin kî ye' tev li pêşengehê bûn. Pêşengeha ji wêne û xêzên li ser jiyan û keda jinan hatine xêzkirin pêk tên. Der barê pêşengehê de em bi Neşe Toprak, Zozan Bor û Fîgan Ektî re axivîn.


Neşe Toprak

Neşe Toprak mamosteya beşa wênexêzê ya KASED'ê bi xebata xwe ya bi navê 'Hêvî' beşdarî pêşengehê bû. Toprak di derheqê xebata xwe de diyar kir ku ew di xêzên xwe de rengê reş û şîn bi kar tîne û wiha got: "Min wêneyên xwe li ser rûpelên rojnameyê bi rengên şîn û reş çêkirin. Reş tarîtiyê, şîn jî hêviyê temsîl dike. Di wêneyan de min xwest bal bikişînim ser jinên ku di girtîgehê de ne aliyekî wan çiqas di tarîtiyê de be jî alî wan ê din tim şîn e yanî hêvî ye."


Zozan Bor

Toprak têkildarî mijara ku wêneyên xwe yên li ser rojnameya Xwebûnê çêkiriye wiha axivî: "Bi taybetî em nûçeyên der barê jinan de di çapemeniya azad de dibînin, ji ber vê yekê min wêneyê xwe li ser rojnameya Xwebûnê xêz kir. Navê beşa min 'Hêvî' ye. Min bi xebata xwe xwest bêjim jinên rojnameger, jinên di girtîgehan de û jinên ku di nav têkoşînê de ne çiqas di tengasiyê de bin jî hêviyên wan bi dawî nabin."


Fîgan Ektî

**Bi wênayan keda jinan xêz dike**

Wênasaz Zozan Bor a ji bajarê Wanê bi xebata xwe ya bi navê 'Ked'ê tev li pêşengeha 8'ê Adarê bû û der barê pêşengiha 8'ê Adarê de ev tişt anî ziman: "Em sê jin bi xebatên cuda lê bi mijarên hevpar tev li vê pêşengehê bûn."

Bor têkildarî naveroka xebata xwe da zanîn ku bi sedema êdî civak her diçe pişta xwe dide çanda xwe û bi vî awayî keda gundewar ji holê radibe û ev tişt anî ziman: "Ez li ser keda jinan sekinîm, ji ber ku jinan jiyan bi keda xwe afirandiye û diafirînin. Lê helbet ev ked her diçe bi modernbûnê re êdî nayê ber çav. Ji ber vê yekê min xwest bi wêneyên xwe balê bikişînim ser keda jinan û çanda ku ava kiriye. Bi rêya wêneyan keda ku em bûne şahidê wê, bigihînim nifşên li dû xwe."

**Dixwazim dîrokê zindî bihêlim**

Wênegir Fîgan Ektî bi xebata xwe ya bi navê 'Jin kî ye?' tev li pêşengehê bû. Ektiya ku di temenê biçûk de dest bi wênegiriyê kiriye, diyar kir ku armanca wê ya bi girtina wêneyên jinan ew e ku ji bo pêşerojê bibin arşîv û wiha got: "Wek tê zanîn dîroka jinên kurd a bi awayekî rêzkirî tune ye. Ji bo vê yekê jî ez bi van wêneyan arşîvê amade dikim. Armanca min bi wênegiriyê de avakirina arşîvekê ye û dixwazim bi vê arşîvê dîrokê zindî bihêlim ku çend sed sal şûnde yê ku li dû me werin bibînin ku jin çawa ked dane û jiyan çawa ava kirine. Ev 25 sal in ez aktîvîst im û di xebatên TJA'yê de cih digirim. Wênegirî jî yek ji van xebatan e."

xwebûn

8-14 Adar 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 64

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Gula di navbera Dîjle û Ferêt de; Nisêbîn[2]



Keştiya Alalû
Agît Yazar



Tê gotin peyva ziyaret, ji zîguratê tê. Di xeleka derbasbûyî de me qala ziyareta Mîrê Cinan, Mîr Osman kiribû .Ev ziyaret li ser girê dîrokî Girnewasê ye. Dîsa min qala ziyareta li ser Girê Mirazan jî kiribû. Ev her du girên hanê, girên dîrokî ne û bi destê benîademiyan hatine çêkirin. Li ser her du giran jî ziyaret hene. Min Girnewasê jî, nola qutîka reş a Nisêbînê pênase kiribû: Te dît di her balafirê de qutîkek reş heye û ew qutîka reş, hemû razên balafirê di xwe de dihewîne. Lema jî min ji Girnewasê re gotibû, qutîka reş a Nisêbînê. Bi raya min Girnewas, gelek razên nayên zanîn di bin xwe de veşartine.

Her wekî tê zanîn li ser Girê Mirazan, ziyaret heye. Bi qasî 7-8 gavan li hêla başûrroavayê ziyaretê, zayînxane derketibû. Kevirê li ser dera deriyê zayînxaneyê jî, sûretê jineke di ber zayînê de bû, li ser hatibû kolandin. Jina zarokê xwe diwelidîne, bi awayekî eyan beyan diyar e. Niha ew kevir di muzexaneya Rihayê de ye.

Ger em vegerin ser ziyareta li ser Girnewasê, gelo di bin Girnewasê de jî tiştekî wanî heye tune ye, ev nayê zanîn. Lê tişta em pê dizanin ew e ku bi qasî 25 km li jêra Nisêbînê, ango di nav erdê Rojava de, Ûrkêş heye. Navê xwe yê din jî Girê Mozan e. Ûrkêş, paytexta pêşiyên me yên Hûrrî ye û dîroka wî xwe dispêre 4 hezar sal beriya zayînê. Ûrkêş û Girnewas, hevçaxên hev in. Ûrkêş, hem paytexta pêşiyên me yên Hûrrî ye, hem jî navendeke wan a olî bûye.

Baweriya bi xweda Teşûp, li Ûrkêşê belav dibe. Teşûp, serxwedayê pêşiyên me yên Hûrrî ye. Xwedayê birûsk, bahoz û baranê ye. Ev dema em qalê dikin, hîna bîn-berata Akadan/Asûran li vê herêmê tune bûye. Paşê ev qewmê samî ji çolistana nîvgirava ereban a îro tên. Hem jî çawa tên! Edetî nola pirpinîkên xwe li ronkahiyê bigirin, wanî xwe li erdê Hûrrî û Sumeran digirin û tên. Ev qewmê samî, cih li pêşiyên me yên li deşta Mezopotamyayê, diherimîne.

Akadên pêşiyên Asûran, derdora 200 salî li welatê Hûrrî-Sumeran hukum dajon. Ûrkêş jî di nav de, hemû bajarên Hûrrî-Sumeran talan dikin.

Berî zayînê di sedsala 22'yan de, pêşiyên kurdan ên di çiyayên Zagrosan de dijiyan, xwe berdidin jêr û dawiyê li hukumdariya Akadan tînin.

Hingê, ji pêşiyên kurdan Gûtiyan re digotin, nola refên kuliyan ji pişt çiya derketin hatin. Heta hinekan ji wan ji pêşiyên me Gûtiyan re gotibûn "cinên çiyayan". Qesta wan ji cinên çiyayan ew bû ku hew didîtin ji nişkan ve Gûtiyan nola nînjayan ew xistin dorpêçê û yekoderb Gûtiyan ew şaht dikirin. Lema jî Akadiyan, ev leqeba "cinên çiyayan" li Gûtiyên pêşiyên me kiribûn.

Baş e kî dikare bibêje Mîr Osmanê Mîrê Cinan yê li ser girê Girnewasê, ne mîrekî ji wan "mîrên cinan" yên pêşiyên kurdan e?

Bi vê hevok-pirsê em ê Mîr Osman li ser girê Girnewsê bihêlin û em ê berê xwe bidin nav Nisêbînê.

**Zanîngeha yekemîn a cîhanê**

Bila heranî dilê xwe nehêlin, lê wer tê fêmkirin ku di encama kolandinên arekeolojîk de, Nisêbîn dora zanîngeha yekemîn a cîhanê, ji heranê standiye. Qesta me ji zanîngehê ew e ku em qala Dêra Mor Yaqûb dikin. Dêr an jî zanîngeha Mor Yaqûb, hezar û 700 sal berê hatiye avakirin. Heta demeke nêzîk jî ev nedihat zanîn. Lê piştî ew kibêsê axê ji ser kavilên dêrê hat rakirin, dîroka wê derket ber ronkahiya rojê.

Dêra Mor Yaqûb, piştî zayînê di sala 297'an ji hêla Romayê ve tê avakirin. Tê gotin ku dêr li ser perestegeheke zerdeştiyan, ango li ser agirgedehekê tê avakirin.

Alimekî bi navê Ezîz Yaqûb, ji Misrê tê û li vê dêrê perwerdeya olî her wiha perwerdeya gelek ilmên din ên wekî zimanê suryanî, tip, astronomî, felsefe, geometrî, matematîk û hiqûqê, dide şagirtên xwe.

Piştî Mor Yaqûb diçe ber dilovaniya xwedê, şagirtê wî yê bi navê Mor Efrem dikeve dewsa wî.

Di binê dêrê de jûreke taybet heye. Tê gotin ew cihê Mor Yaqûb ê xwendin, nivîsandin û fikirandinê bûye. Çengelek hesinî di bin banê jûrê de heye. Dîsa tê gotin hingî Mor Yaqûb dixwend, carna jê li ser kitêban dihêniijî. Ji bo di xew re neçe, porê xwe bi benekî girêdida û davêt wê çengelê, da ku wexta li ser kitêban bihênije, porê wî yê bi çengelê ve girêdayî were rakişandin û biêşe. Bi vî awayî bi xwe vehese û cardin rabe xwendina xwe bikudîne.

Dêra Mor Yaqûb, li derdora 50 salî xizmetê ji şagirtên Mor Yaqûb û Mor Efrem re dike.

Di sedsala 4'emîn de, Sasanî bi artêşeke mezin digirin ser Nisêbîna di destê Bîzansiyan de. Lê Sasanî çer jî dikin, nikarin derbasî nav sûra zexm a li dora Nisêbînê bibin. Paşê radibin bendavekê çêdikin. Ava gewimandî ya bendavê bi qontrol diteqînin û arasteyî ser sûra bajêr dikin. Çawa ava bendavê li sûrê diqelibe, dîwarê sûrê hildiweşe. Lê nişkegaviyek ango sûprîzek nedihat hêvîkirin, Sasanîyan pêşwazî dike. Lewra Bîzansiyan, di hundirê sûrê de, sûrek duyemin ava kiribûn û gava ava bendavê li dîwarê sûrê yê yekemîn dikeve, hinekî sist dibe û hukmê wê yê dîwarê sûra duyemîn birûxîne, namîne.

Sasanî ji ya xwe nayên xwarê. Radibin ji nû ve tevdîr û tifaqa xwe digerînin, ka ew dikarin çi bikin çi nekin! Aqilmendek radibe dibêje em ê bi hezaran dûvpişk û mahrên tirsnak ên jahrînî berhev bikin û bînin berdin nav bajêr. Wer jî dikin. Şahê Sasaniyan fermanê li nav welatê xwe belav dike. Ji derdora Hindê bigire heta çiya û zozanên welêt, bi sedan cirên tije mahr û dûvpişk berhev dikin û tînin bi mencenîqê wan cirên tije cinawirên jahrînî davêjin nav sûrên Nisêbînê. Bi vî awayî Nisêbîn teslîm dibe û dawî li pergala zanîngeha Mor Yaqûb û Mor Efrem tê.

Ê te dît ev der Nisêbîn e! Me gotibû gula di nabera her du çemên pîroz, Dîjle û Ferêt de ye û feylozof jê xalî nabin.

Em gera xwe ya li nav kavilên zanîngeha nisêbînê diqedînin û berê xwe didin gundê Sitlîlê, li ser tirba filozofê serdema me, tirba Apê Mûsa.

**Apê Mûsa**

Xwînerên ezîz. Niha ez bi hêsanî dikarim bibêjim heke ez îro van reşbelekan dinivîsim û hûn jî van reşbelekan dixwînin, teqez ev bi saya serê Apê Mûsa ye. Ger ji bo hinekan Apê Mûsa filozof be, ji bo min hem filozof e, hem jî memosteye.

Belê gorbihiştê bavê min carna ji me re şiîrên Cegerxwîn û kitêbên Ehmedê Xanî dixwendin. Lê cara ewil min xwendina metneke kurdî ji rojnameya Welat xwend. Nexasim jî min nivîsên Apê mûsa dixwendin. Xwendin çi ye! Min ew nivîs, nola qurtek av vedixwar. Gava rojnameya Welat dihat ber destê min û wê hefteyê nivîsa Apê Mûsa di rojnameyê de tune bûya, mîna ereb li talanê min bixîne, ez wanî xemgîn dibûm. Min ji wî nivîskarê ku wê hefteyê di dewsa Apê Mûsa de di quncika wî de nivîsandibû, qicix digirt.

Vê carê me sînorê di navbera bakur û rojavayê welêt de, daye li ser milê xwe yê çepê. Dîsa em li FM'a Rojava guhdarî dikin û berê me li gundê Stîlîlê ye; gundê ku Apê Mûsa lê di aramgeha xwe ya ebedî de razaye.

Ez tu tiştî ji vê mesela "Bakur, Rojava" fêm nakim. Çi yanî! Her welatekî tu têlên rêsayî di nîvê wî re bikişînî qey alîyek dibe bakur û aliyê din jî dibe rojava?!

Ez hezar tif û naletê li vê çarenûsê tînim. Wextekê ji bo kal û pîrên me, dinya bê sînor, bê ser û bê ber bûye. Lê niha yên ji çolistanê req û rût hatin, ji wan çolên tenê ji ajalan kêzik û gumgumok, ji dar-beran jî, kelem û dirîk lê hebû hatin û jiyan li ber me herimandin.

Pêşiyê me Keyxwusrewê mezin ew têkbirin. Vêca parsekên ji derdora Hindistanê rahiştin defik û tipilkên xwe, rahiştin tûtik û fîrfîrkên xwe û hatin. Hîna deverên ku parsekên ji Hindê hatibûn lê mîztibûn giha lê şîn nehatibû, vêca pêxwasên ji kurên reqerût yên Asya Navîn, ji stepên xwe yên qeraç hatin. Li ser pişta hespên xwe yên hûrik û bipirçik siwarbûn, hatin. Hatin û nola dinyanedîtiyan bê ronî xwe li xweşikahî û dewlemendiya welatê me qewimandin. Nanên di destê zarokên me de, revandin. Firaxa li ber me herimandin. Bûn mişk û ketin nav girara me. Welatê me zîrtolzîrtolî kirin û sînor li ser sînga welatê me lêkirin...

**Dara çinarê**

Bi van hestên tevlihev em gihaştin gundê Stîlîlê. Jixwe hewce nedikir me mala Apê Mûsa ji kesekî bipirsiya. Lewra zir-çinara dara wî ya bilind, bangî kesên xerîb ên diçin serdana Apê Mûsa dike, dibêje weriiin, vaye apê we Mûsa li vir li binê siya guliyê min li benda we ye!

Gava em daxilî nav bihuşta Apê Mûsa dibin, darên fêkî yên bihuşta wî, em pêşwazî dikin. Paşê refek çivîk bi fîrîneke çivûdûv, nola li pêşiya me bireqisin, wanî me pêşwazî dikin. Ez di dilê xwe de dibêjim, hebe tune be teyrikên bihuştê ev bixwe ne. Ango ev teyrikên hanê, yên li nav bihuşta Apê Mûsa, giyana generalên wî yên biçûk in, giyana Oxir Qaymaz, Ceylan Onkol, Muharem Taş, Cemîle Cagirga û yên, yên, yên din in.

Ez li dora çinara Apê Mûsa dizîvirim. Bi dehan movik û terhên nû li dora koka wê ya stûr dibînim. Dengê Hecî Mahmûdê stîlîlî di guhê min de dizinge: "Şêxo (Mûsa) tu dizanî ev dara çinarê tu yî. Ev katikên hanê yên ji ber koka wê çûne jî, ev gêncên me yên telebe yên li ber xwe didin, ew in!"

Paşê ez gavan ji gavan didizim û ber bi tirba Apê Mûsa ve dimeşim. Vêca Apê Mûsa li Hecî Mahmûdê Stîlîlî vedigerîne: "Belê Hecî! Îşê dinê wanî ye. Ez jî terha li ber dara Cegerxwîn, Mîr Celadet Bederxan û yên din bûm. Ew dar hişk bûn, niha ez hêşîn im. Sibê ez ê hişk bibim, ev terhên li koka min ketine ew ê hêşîn werin. Binêre Hecî Mahmût, mêrê çê di ser navê xwe de tê! Vaye ev ê porkurîşkê li ber serê min, yek ji wan e!..."

